Azadiya
# WELAT
Rojnameya Hefteyî
www.welat.com 171
8-14 gulan (Mayıs) 1999
BUHA (Fiat): 250.000 TL
ISSN 1301 7497

Ewrûpa amadehiya darizandina Tirkiyeyê dike:

# DMME'ê ji Tirkiyeyê parêzname xwest



✔ Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê, ji Tirkiyeyê heta 30'ê meha pûşperê parazname xwest. Bi vê yekê dê DMME bikaribe hem bi Öcalan re, hem jî bi şahîdan re hevdîtinê pêk bîne. Piştî vê rûdanê bi rojekê, komên di bin banê Parlamentoya Ewrûpayê de, der barê rewşa Öcalan û Kêşeya Kurd de pêşnûma pêşkêşî parlamentoyê kirin û wan xwest ku Öcalan di dadgeheke navneteweyî de bê darizandin.
(Nûçe:R-3)

*Nadire Mater li ser "Pirtûka Mehmed" axivî:*

## Dayik nobeta zarokên xwe dişopînin



✔ Pirtûka Nadire Mater a bi navê "Pirtûka Memed" dîroka 'gayrî resmî' ya şer e. Pirtûkê gelekî deng veda. Lewre leşkeran "tiştên ku ji dayika xwe re negotine" anîne ser zimên. Mater, der barê rewşa leşkeran a piştî şer û malbata wan, naveroka pirtûkê, helwesta çapemenî û dewleta tirk a "nefermî" de dîtinên xwe diyar kirin.
(Hevpeyvîn:R.8-9)

NAMEYÊN ZAROKAN BO ÖCALAN:

## 'EZÊ BIBIM ABÛKAT Û TE RIZGAR BIKIM'



Hevalên hêja, hêzên dagirker û împeryalîst, serokê kurdan bi komployeke navneteweyî dîl girt. Ew niha li Girava Îmraliyê di bin mercên giran de dijî. Hemû têkiliyên wî bi cîhanê re hatine qutkirin, lê gelê kurd jî ji bo ku wî bi tenê nehêle di nava xebatê de ye. Hinek hevalên we jî name ji wî re bi rê kirine, kopiyeke wan nameyan jî ji abûqatên wî re hatiye şandin. Em ji wan nameyan çend heban ku tê de evîn û hesreta dilên biçûk heye, pêşkêşî we dikin.
(Rûpel:12)

ARAFAT DEWLET ÎLAN NEKIR

## SERXWEBÛNA FÎLISTÎNÊ 'MA BIHAREKE DIN'



4'ê gulanê ji bo filistîniyan wekî rojeke dîrokî hatibû diyarkirin. Wan hêvî dikir ku dewleteke serbixwe were îlankirin lê ev hêviya wan ma bihareke din. Her du aliyên şer jî vê yekê wekî serkeftina xwe dibînin. Gelê Filistînê jî başkirina rêveberiya heyî dixwaze.
(Rûpel:11)

**Azadiya WELAT**



E–Mail:s.berbang@usa.net

SAMÎ TAN

# Biryara ITC'yê ne siyasî ye, tîcarî ye

> Di nava gel de peyvek heye dibêjin, "De were nemire nebihece", kesê ku bi hinceta handana şer dengê 40 milyon mirovî dibire, çekan difiroşe kujerên wî gelî, ango melkemotê kurdan bi çek û rext dike.

Amadekarên komploya navneteweyî ev demek e dirêj e berê xwe dane navgînên ragihandinê yên kurdan. Wekî encama vê komployê tekane televîzyona kurdî MED–TV hate girtin. Saziya ku ev biryar girt, wekî Komîsyona Serbixwe ya Televîzyonê (ITC) hatiye binavkirin. Gelek kes wê wekî saziyeke serbixwe û bêlayan dibînin, lê piştî biryarê rojnameya Özgür Politikayê bêlayaniya wê bi nûçeyekê li ber çavan raxist. Tiştê ku derket holê skandalek bû, lê vê yekê di qada navneteweyî zêde deng veneda. Bi tenê hinek komikên li dijî şer ev skandal şermezar kir. Li gorî nûçeyê Serokê ITC'yê Sir Robin Biggam şîrikê şîrketa bi navê British Aerospace ye. Ev şîrket çekan difiroşe Tirkiyeyê. Piştî ku biryara girtina MED–TV'yê hate dayin têkiliyên vê şîrketê bi Tirkiyeyê re germtir bûn. Ev şîrket dê ji bo polîsên tirk çekan hilberîne.

Di nava gel de peyvek heye, dibêjin, "De were nemire nebihece", kesê ku bi hinceta handana şer dengê 40 milyon mirovî dibire, çekan difiroşe kujerên wî gelî, ango melkemotê kurdan bi çek û rext dike. Bi vê yekê niyeta ITC'yê jî zelal dide. Rêveberê MED–TV'yê digot: "Me parêznameyeke baş da ITC'yê, me got em dê kêmasiyên xwe ji holê rakin, emê li gorî mercên ITC'yê weşana xwe bikin, wan jî gelekî bi erênî nêzîkî di me da, lê çima ev biryar hate girtin?" Her tişt li ber çavan e, biryar ne siyasî ye jî, biryara ITC'yê sedan sed tîcarî ye. Lê, her wekî rêveberê MED–TV'yê Hikmet Tabak got, dê gelê me bê televîzyon nemîne, dê ev lîstik giş bi avê de biçin.

Balkêş e, kujerên me mafê revîna ji mirinê jî nadin me, fermana gelê me radikin, lê dema gelê me li dijî vê yekê serî radike, wekî terorîst tê binavkirin. Her cure çekan diforişin neyarê gelê me, serokatiya wî gelî bişînin ber sêpêtiyê, dema ew gel vê rewşê protesto dike, dibe terorîst. Bi awayekî xwezayî navgînên ragihandinê yên wî gelî wekî handêrên şer tên binavkirin. Rizgarbûna ji toqa mirinê di destê me de ye. Bi taybetî dema medyaya kurdî bi awayekî baş xebata xwe bike, dê rûyê kujer û hevalbendan wan reş bike. Ji bo xabeteke baştir pêdivî bi rêxistinîbûnê heye. Rêxistinên siyasî têrê nakin, divê di warê pîşeyî de jî rêxistin pêk werin.

Niha rojnamegerên li Ewrûpayê birêxistin bûne, Yekîtiya Rojnamegerên Kurdistanê hatiye avakirin. Divê li welêt û Tirkiyeyê jî di vî warî de hinek gav bêne avêtin. Lê astengiyên hiqûqî gelek in li pêşberî vê yekê.

Heta ku ev gav bê avêtin, bar bi temamî dikeve ser YRK'ê. Heta niha hinek xebat hatine kirin, lê ev xebat têrê nakin. Divê YRK têkiliyên xwe bi saziyên navneteweyî re xurtir bike, her wiha divê ew dengê saziyên li welêt rabigihîne wan deran, li ser pest û pêkutiyan cîhanê agahdar bike. Di warê perwerdekirina kadroyan de divê hin xebat bêne kirin. Li Ewrûpayê derfetên vê yekê hene. Berî her tiştî divê di xebatên xwe yên hundirîn de zimanê kurdî bikin zimanê serdest û xwe ji zimanê serdestan rizgar bikin. Roja 9'ê gulanê Kongreya YRK'ê heye, em hêvî dikin ku rêveberiya nû van dîtinên me wekî pêşniyaz bibîne. Bi hêviya serkeftinê em kongreya YRK'ê silav dikin.

# Rojên pêş rojên serkeftinê ne




Fîlmê "Îsa" bi kurdî jiyan û ramanên Hezretî Îsa dide pêş. Ev berhem, dê kesê ku hûn bawer in hûn wî nas dikin ji nêz ve bi we bide nasîn.

NAVNÎŞANA XWESTINÊ

PK.8 Acıbadem 81020

**İSTANBUL**

VEDAT AYDıN

Şerê rizgariya neteweyî di 15 saliya xwe de dikeve qonaxeke nû. Di nava van 15 salên şer de pêşketin û guherînên mezin û dîrokî pêk hatin. Ji aliyê civakî, neteweyî û navneteweyî ve, misteweya ku hatiye bidestxistin, nayê redkirin. Lê digel van gavên giranbiha jî wekî ku serok Apo dibêje; "Di vî şerî de em ne tam bi ser ketin û me ne jî winda kir."

Belê şer êdî hatiye pêvajoyeke wisa ku, li gorî vê pêvajoyê guhertinên nû pêk neyên, dê xetereyên mezin jî derkevin pêşberî têkoşîna me. Divê êdî şer biqewize radeyeke nû. Ji her aliyî ve "nûbûn"ek pewîst e. Ji ber vê yekê Tevgera Rizgariyê di pêvajoya Kongreya Şeşemîn de "jinûvesazî" xistiye rojeva xwe.

Divê her tişt li gorî rastiya xwe bê nirxandin. Di nava rêxistin an jî partiyekê de guherîna bingehîn ne tiştekî ji rêzê ye. Lê carina ji bilî avêtina gavan tu çare namîne. Divê ev yek baş bê zanîn; kesayetiya kurdê kevn, xeletî û tawanên kesayetiya ketî li ber serkeftina dawî astenga herî mezin e. Ji ber vê yekê jî divê 'restorasyon' ji vir dest pê bike.

Çima 'Jinûvesazbûn?' Sedemên vê yekê çi ne? Di vî warî de rola dijmin çi ye? Nûbûn dê çawa pêk were? Divê gelê me çawa nêzîk bibe?

Rewşa Komara Tirk û hevkarên wê li ber çavan e. Dijmin bêwestan û rawestan êrîşên xwe berdewam dike. Armanca refê dagirker û împeryalîstan bi komploya li ser Serokatiyê qirkirina gelê kurd e. Di nava planên wan de ji bo gelê me jiyan tune ye. Şûrê wan ê qetlê li ser serê gelê me diheje. Û li ser vî şûrî talan û tevkujî dinivîse.

Belê rastiya dijmin diyar e. Lê divê rastiya me jî diyar bibe. Digel van êrîşên faşîst, derfetên serkeftin û dewletbûnê jî derketine holê. Lê êdî bi şêwe û nêzîktêdayînên berê têkoşîn nadome. Bi helwesta kurdayetiya berê; bi giyan, mêjî û xebata nîvco serkeftin pêk nayê. Heta niha digel fedakarî û wêrekiya mezin dîsa jî em li gorî rêz û rêçikên bav û kalan meşiyan. Tevlîbûna me ya şer, ne li gorî perspektîfên serokatiyê bû. Hema bêje di her warî de, me bi destkeftinên biçûk qîma xwe anî. Di vî warî rêxistinî, perwerdehî û zanîna me pir kêm ma. Me xwe biçûk dît û bo serkeftinên mezin me xwe amade nekir.

Giranbûna demê ji me kesayetiyên serkeftinê dixwaze. Ne şoreşgeriyeke kêm û çewt; lê şoreşgerî û welatparêziyeke li ser rêz û rêçikên ku Serokatiyê bo me daniye ferz e. Ev yek di Kongreya Şeşemîn a Partiyê de careke din hate zimên. Di serkêşiya wê de tevlîbûn, welatparêzî û şoreşgeriyeke nû li ser milê me barê namûsê ye.

Berî her tiştî dem dema fedaîbûnê ye. Êdî ne yeko yeko şervan û partîzan; lê hemû gel divê bibe fedayî. Biryarek ji biryarên kongreyê ev e.

Mirov û gelê fedayî, berî her tiştî tê wateya vîn, bawerî û wêrekiyeke serdanpê. Bêyî jixwebaweriyê û jiyaneke di welatekî serbixwe û azad de şer nayê meşadin. Ji bo vê jî heta dawiyê rêxistinîbûn û çalakbûn divê.

Rêxistinîbûn û çalakiyên ku di riya armancên pîroz de hatine sazkirin dê gelê me bi ser bixin. Bo me, Zîlan, Rewşen, Bermal; Sema, Fîkrî û M. Xalit di vî warî de sembol in.

Hetanî niha qîmeta gotinan hebû; lê divê ji îro pê ve em gotinên bêçalakî bo xwe wekî sûc bihesibînin. Her kurdek divê ji îro pê ve tevgera li pey berjewendiyên şexsî yan jî malbatî li xwe heram bike. Girêdana nirxên neteweyî, girêdana bo Serok Apo bi tenê wiha gengaz e. Fedayîbûn û şoreşgeriyeke seranser di riya serkeftinê veke. Ev jî dê yekbûna mêjî û dil û di birdozî û polîtîkayê de kûrbûnê dixwaze.

Belê pêvajoya nû digel her tiştî ji bo me bi hêvî, azadî û serkeftinê mişt û tijî ye. Bes, em xwe ji nû ve saz bikin û bi her awayî bibin bersiv.

AZADIYA WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ (Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308
Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212) 251 79 37 – 251 90 13
FAX: 251 95 85
■ Gerînendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMÎ TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Ses Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NIVÎSGEHÊN TÊKILIYÊ
(İrtibat büroları)

■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ İzmîr
Tel: 0 (232) 446 19 50
■ Mêrsîn
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ (Nûnerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

■ Swîsre:
Ihsan Kurt
Tel–fax
41 21 652 76 07
■ Almanya:
Fener Rojbiyanî
Tel: 49 228 92 51 284
■ Sweden:
Şoreş Reşî
Tel: 46 86 52 34 29
■ Fransa:
M. Ali Doğan
Tel– 33 614 32 43 55
■ Belçika
I. Can
Tel:32 53 64 12 41
■ Hollanda:
S. A. Fewzî
Tel–Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helîm Yûsiv

www.arsivakurdi.org

## Ewrûpa amadehiya darizandina Tirkiyeyê dike:

# DMME'ê ji Tirkiyeyê parêzname xwest

**Piştî vê biryarê, wê DMME di cih bikaribe hem li Öcalan hem jî li şahidan guhdariye bike. Li gorî Hasip Kaplan ev jî tê wateya darizandina Tirkiyeyê. Bi baweriya Kaplan, doza Öcalan dozeke navneteweyî ye û wê darizandin jî navneteweyî be.**

Di Doza Sedsalê de Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê DMME dê Tirkiyeyê bidarizîne. ...erî niha DMME'ê der barê doza Öcalan ...e bo Tirkiyeyê biryara "îhtiyatî tedbîr" ...irtibû. Piştî vê biryarê DMME'ê bi bir...areke nû, ji Tirkiyeyê heta 30'ê meha ...ûşberê parêzname xwest. Li gorî ragi...andinan ji parêzerên Öcalan Hasip Kap...an 29'ê meha avrêlê serî li DMME'ê da...e. DMME'ê daxwaza Kaplan pejirandi...e û ji bo ku Tirkiye mafdarbûna xwe di...ar bike, parêznameyeke nivîskî jê ...xwestiye.

**Pirsên DMME'ê**

*Li gorî xala 6'an a peymanê rêz li hem...berî mafê parastinê tê girtin? *Kesê ku ...daxwazname daye, ligel parêzeran li gorî CMUK'ê hevdîtinên taybet dike an na? *Hevdîtin di mercên çawa de pêk tên? *Yê daxwazname daye, bi awayekî azad ...i parêzerên xwe re diaxive? *Hevdîtin, ...ên sînorkirin an na? *Yê daxwazname daye li Îmraliyê di rewşa tecrît de ye? *Awayê darizandinê wê li dadgeheke alî negir û serbixwe çebibe an na?

Li gorî vê yekê, wê parêzerên Öcalan ...aparastinê (karşı savunma) bidine DMME'ê. Bi vê yekê wê DMME jî birya...a hêjayî nirxandinê bigire. Piştî vê bir...arê wê DMME di cih bikaribe hem li Ö...calan hem jî li şahidan guhdariyê bike. Li gorî Parêzer Hasip Kaplan ev jî tê wateya darizandina Tirkiyeyê. Bi baweriya Kap...lan, doza Öcalan dozeke navneteweyî ye ...û wê darizandin jî navneteweyî be. Ew, ...diyar dike ku vê pêvajoyê dest pê kiriye, ...wê hemû dewlet bi rastî û çewtiyên xwe ...li pêşberî dîrokê cihê hêjayî xwe bigi...rin.

**Ji PA'yê bo Öcalan pêşnûma**

Piştî biryara DMME'ê komên di bin ...anê Parlamentoya Ewrûpayê PA'yê de ...bi şeweyekî hevpar, di pêşnûmaya ku der ...barê rewşa Serokê Giştî yê PKK'ê Abdul...lah Öcalan de amade kiriye de, ragihand ...ku pêwîst e Kêşeya Kurd bê çareserkirin. Koma Yekîtiya PA'yê di pêşnûmaya xwe ...de da zanîn ku, ji bo pekhatina demokra...siyê, pêwîst e mafên mirovan û hindikahi...yan bêne naskirin. Yekîtiya PA'yê di ber...dewama pêşnûmayê de diyar dike ku ji bo ...rawestina şer, hikûmeta ku wê ava bibe, ...divê berê xwe bide reforman û di qanûna ...bingehîn de guherînan pêk bîne, da ku rê ...li ber danûstandinê vebe. Her wiha Yekî...tiyê pêşniyaz kir ku, bo pêkhatina van ye...kan, pêşîn pêwîst e têkilî bi nûnerên gelê ...kurd re bê danîn. Di pêşnûmeya ku ji aliyê Koma Demokrat a Lîberal ve hatiye ama...dekirin de, sernavekî wiha hatiye da...nîn:"Pêşeroja Kêşeya Kurd û Birêz Öca...lan" Ev kom jî, biryara DGM'ê ya îdamê ku ji bo Öcalan girtiye şermezar dike û dibêje: "DGM nikare darizandineke dadyane (adîl) bike. Ji bo pêşketinê, li herêma ku kurd lê dijîn, divê reformên aborî, siyasî û civakî pêk bên." Koma Sosyalîst jî di pêşnûmaya xwe de diyar dike ku, Serokê Giştî yê PKK'ê Abdulah Öcalan , bi tenê li Ewrûpa û dadgehên navneteweyî dikare were darizandin. Di pêşnûmaya Koma Keskan de jî tê diyarkirin ku, ji bo aştiyê û demokratîkbûna Tirkiyeyê, pêwîst e mafên çandî, civakî û polîtîk ên kurdan bêne naskirin. Hemû koman ji bo rewşa tenduristiya Öcalan bang li CPT (Komîteya Raçavkirina Îşkenceyê)'ê û Xaça Sor kir. Her wiha dîsa bang li Yekîtiya Ewrûpayê û Tirkiyeyê jî hate kirin, ji bo ku li gorî normên hiqûqî yên DMME'ê û Konseya Ewrûpayê tevbigerin.



Bala gelek heyetên ji welatên cur bi cur li ser doza Öcalan e.

**Parêzerên Öcalan:**

**'Heke wiha be emê vekişin'**

Li gel van rûdanên navneteweyî dewleta tirk hîna jî li ser Öcalan tecrîtê didomîne. 5'ê meha gulanê li ser rewşa giştî ya Öcalan parêzerên Öcalan, li Hotela SED a Stenbolê civîneke çapemeniyê li dar xist. Daxuyanî ji aliyê A. Zeki Okçuoğlu ve hate xwendin. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku, ger di demeke nêzîk de mercên parastinê neyên pêkanîn, ew dê dest ji parastinê berdin. Okçuoğlu da zanîn ku, ne di Dadgehên Îstîklal de, ne di Dadgehên Leşkerî de û ne jî di dadgehên piştî rêvberiya leşkerî de, mafê parastinê û parêzer beramberî ewqas neheqiyan nemaye. Wî got: "Ligel ku dewleta tirk alîgiriya qanûnên navneteweyî dike, di doza Öcalan de, ji ber qanûna tedbîrê û êrîşên li ser me, me nekarî peywira xwe baş bi cih bînin." Okçuoğlu da zanîn ku Öcalan gotiye, dê ew piştgiriya çareseriya demokratîk û aştiyane bike: "Em ne tenê Öcalan, em dixwazin parêzeriya biratiyê û aştiyê jî bikin. Em heman nêzhiktedayinê ji parêzerên mudaxîl jî hêvî dikin." Wî da zanîn ku Öcalan hîna ji aliyê komîsyoneke bi navê "Komîsyona Lêpirsînê" ve tê pirsiyarkirin. Dîsa wî diyar kir ku berî doz bi dawî bibe, çapemenî û rêveberên dewleta tirk muwekîlê wî wekî "kujerê zarokan, hov û ser cudaxwaz" tawanbar kiriye û divê bi vî awayî bandorê li darizandinê nekin. Okçuoğlu got ku, muwekîlê wî ne sûcdar e û ji dewletê daxwaza rakirina rewşa tecrîtê û pêkanîna mercên parastinê kir.

**Di anketan de Kêşeya Kurd**

Li gorî Înstûtiya Lêkolînên Stratejîk yên Navneteweyî (ESAE)'ê polîtîkaya dewleta tirk a nîjadperest, ku di Kêşeya Kurd de bi kar aniye, bi awayekî neyînî encam daye. Di rapora USAE'yê ya sala 199899'an de li ser Kêşeya Kurd û xwesteka bi hêzbûna Tirkiyeyê ya li Rojhilata Navîn tê rawestandin. Di rapora ku ji aliyê Zanîngeha Oxfordê ve hatiye amadekirin de, tê gotin ku di şerê 15 salan de, ji her du aliyan 30 hezar mirovî jiyana xwe ji dest daye, lê dîsa jî dewleta tirk nikaribûye muxalefeta kurdan têk bibe. Dîsa tê diyarkirin ku ji dêvla Tirkiye Kêşeya Kurd bi riyên dîyalog û polîtîk çareser bike, welatên li dora xwe tawanbar dike. Wekî din tê daxuyandin ku Tirkiye ji aliyê leşkeran ve tê birêvebirin. Li gorî înstutiyê, sedema wê yekê jî qelsiya partiyên siyasî ye.

Li aliyê din tê gotin ku artêş di Kêşeya Kurd de polîtîkaya êrîşkariyê bi awayekî rehet bi kar tîne û hêzên sivîl, berî artêşê çareseriyên mîlîtarîst pêşniyaz dikin. Di dawiya raporê de tê xuyakirin ku dewleta tirk ji ber têkiliyên xwe yên bi welatên li Rohilata Navîn re, dike ku ji Yekîtiya Ewrûpayê biqete. Her wiha rapor, dide zanîn ku Tirkiye di nav dewletên yekem ên ku dê bikevin Yekhitiya Ewrûpayê de cih nagire.

NAVENDA NÛÇEYAN

## Kurtenûçe

### ARGK'Ê KEMÎN DANÎ: 9 LEŞKER HATIN KUŞTIN

Li pey ragihandina Parêzgariya OHAL'ê li navçeya Yaylıdereya bi ser Çewlikê ve hêzên artêşa tirk li kemîna gerîlayên ARGK'ê qelibîne, 9 leşker hatine kuştin, 5 jî bi xedarî birîndar bûne. Li pey agahiyan, bûyer roja 4 gulanê danê êvarê pêk hatiye û piştî êrîşê tevgereke leşkerî ya berfireh hatiye lidarxistin. Dîsa li navçeya Çelê bi ser Çolemêrgê ve di encama kemîna gerîlayan de 10 leşker hatine kuştin. Di heman çalakiyê de tanqek û du jîpên leşkerî hatine rûxandin. Li aliyê din 3'yê gulanê panzerek li navçeya Midyadê li mayînan qelibiye, 8 leşker mirine û yek jî birîndar bûye. Wekî din li pey agahiyan ARGK'ê li gelek cihan rê birîne û nasname raçav kirine.

### RSF: TIRKIYE RÊ LI BER ÎŞKENCEYÊ NAGIRE

Rojnamegerên Sînornenas (RSF) di rapora xwa ya sala 99'an de diyar kir ku ji bo îşkence û şîdeta polîsan ji holê rabe li Tirkiyeyê bergirî nayên danîn. RSF'ê di rapora ku bi boneya 3 gulanê roja azadiya çapemeniyê ya cîhanê weşandin de, dide zanîn ku her çend dewleta tirk îmzeya xwe avêtiye bin hinek peymanên navneteweyî jî dîsa îşkence bi awayekî giştî didome. Li gorî raporê di sala 1997'an de 16, 1998'an de 9 rojnameger beramberî îşkenceyên zor xedar mane. Bi awayekî giştî 264 rojnameger hatine binçavkirin. Di raporê de êrîşên li dijî MED–TV'yê jî cih digirin û tê gotin ku artêşa tirk gelek caran bi sînyalan weşana MED–TV'ê asteng kiriye. Wekî din daxwaza serbestberdana Îsmail Beşikçi, Hasan Özgün û Doğan Güzel hatiye kirin.

### MHP LI ÎDIRÊ MALÊN KURDAN XERA DIKE

Li Îdirê li Taxa 7 Kasım, ku HADEP partiya yekemîn e, 10 xaniyên kurdan ji aliyê belediyeyê ve hatin xerakirin. Li pey ragihandinê Serokê Belediyeya Îdirê yê MHP'yî Nurettin Aras bi taybetî berê xwe daye taxên ku HADEP lê partiya yekemîn e. Li gorî agahiyan, malbatên ku li bûyerê hesiyane li dijî belediyeyê derketine, lê bi fermana serokê belediyeyê, zabita û polîsan êrîş birine ser malbatan. Di encama êrîşê de 8 jin birîndar ketine. Li aliyê din Waliyê Îdirê jî ji ber encama hilbijartina nerazîbûna xwe bo mamostayan diyar kiriye û gotiye: "Diviyabû HADEP'ê evqas deng nestanda." Şaxa Eğitim-Senê ya Îdirê helwesta walî şermezar kir.

www.arsivakurd.org

# Helwesta KT'ê ya li dijî raperînên berê û PKK'ê


Seyîd Rıza


Şêx Seîd

Komara Tirk bi xapandin, dek û dolaban gelek serkêşên raperînên kurdan digire û darve dike.

**Rêveberên tirk di destpêka avabûna komarê de heyetan dişînin cem serokên raperînan û bi kurdan re li nev rûdinên heta M. Kemal destê serekeşîrên kurd maçî dike.**

Ji bo me kurdan tevdan û naskirina dîroka KT'ê bi qasî naskirina dîroka nûjen a Kurdistanê girîng e. Naskirina KT'ê ji her aliyî ve bi xwe re zelalkirina dîroka Kurdistanê û gelên Anatoliyê ya vê sedsala jî tîne. Dîsa, ji bo pêşeroja me pêwîst e ku ev dîroka qirêj were zanîn û analîzkirin. Çimkî KT hêza xerakirin û berevajîkirina dîroka gelê me ye. Pêwîst e dîrok, li gorî dilîn û daxwaziya dil neyê şîrovekirin, li gorî rastiya gelan were şîrovekirin.

### Di navbera kurdan û dewletê de hevdîtin pêk tên

Di dîroka KT'ê de darî çavan e ku, piştî destpêkirina her serhildana kurdan rêveberên komarê di demeke kin de, heyetek ji qeymeqem, walî û fermandarên leşkerî û hwd. şandiye ba serokê serhildanan û daxwaza xwe ya bo lihevhatinê pêşkêş kiriye. Ev 15 sal in şerekî giran li Kurdistanê tê meşandin lê, tiştekî wisa pêk nehatiye. Ji aliyê PKK'ê ve sê caran agirbest hate îlankirin û daxwaza lihevrûniştinê hate pêşniyazkirin, lê, wan ev yek red kir û hetanî dawiyê di meşandina şerê qirêj de serhişkî kir.

Helbet ne ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurdistanê heyet şandin ba serkêşên serhildanan. Armanc xapandina wan bû. Ev yek di encama raperînan de baştir zelal bûye. Dr. Nûrî Dêrsimî gelek mînakên li ser vê yekê di pirtûka xwe ya bi navê "Kürdistan Tarihinde Dersim" de bi rengekî vekirî li ber çavan radixe.

Bi gelemperî, hêzên dagirker û paşverû di pêvajoya raperîn û şoreşên ku li hemberî wan pêk hatine de piştî demekê dest bi vê taktîkê dikin û daxwaza lihevrûniştinê dikin. Hema bêje, li hemberî tevahiya şoreş û raperînan dagirkeran dest avêtiye heman taktîkê. Mirov dikare armancên vê taktîkê wiha rêz bike:

1– Di hêza li hemberî xwe de tespîtkirina xalên lawaz û ji bo têkbirina raperînê sazkirina taktîk û polîtîkayên nû.

2– Di pêvajoya hevdîtinê de tespîtkirina kesên xwefiroş. Bi pereyan û sozên din (mîna soza ku dane Yezdanşêr), din xapandina wan. Li hemberî şoreşê û raperînê bikaranîna wan. Di encamê de perçekirin û tunekirina dijminê xwe.

3– Karkirina demê û belavkirina hêrs û kîna dijminê xwe. Belavbûna hêrs û kîna kesinên ku di raperînê de cih girtine, pirî caran bi xwe re parçebûn aniye. Fîlîstîn û Îrlanda di vî warî de mînakên berbiçav in. Di pêvajoyên wisa de gelek hêzên şoreşger parçe bûne, heta carinan parçebûna wan bûye destpêka dubendî û pevçûnên di navbera wan de. Ev yek jî gelekî bi kêrî hêzên dagirker hatiye. Jixwe armanca wan jî bidestxistina encameke wiha ye.

Bi şandina heyetan û bi xwestina lihevrûniştinê, dixwazin di çavê gel de xwe mafdar nîşan bidin, hevalbendên xwe zêde bikin. Bi taybetî jî, gelê xwe û kesinên lawaz ên di civaka bindest de ber bi xwe ve bikşînin. Armanca hêzên paşverû ev yek e. Lewre jî dest bi taktîkên lihevrûniştinê dikin. Bi piranî jî ew bi ser ketine û derbeyên mezin hêzên şoreşger û gel xistine. Serkeftinên wan ên li Fîlîstîn û Nîkaraguayê darî çavan e.

Daxwaza lihevrûniştinê û gengeşiyê ji kîjan aliyî bê ew alî xurt e. Di vir de xurtbûn ne bîrdozî û mafdarbûna dozê ye, xurtbûna leşkerî, polîtîk û rêxistinî ye

Raperînên Kurdistanê ji ber ku di xalên navborî de, lawaz bûn, wan xwe negihand asta têkbirina polîtîka û taktîkên neyar. Em dibînin ku bi şandina heyetan re hin kes dudil bûne û hêza wan lawaz bûye. Sedema têkçûna Raperîna Dêrsimê û girtina Seyid Riza mînakeke balkêş e. Waliyê Dêrsimê ji Seyîd Riza re rameyekê dişîne û jê re dibêje ku, wan hemû daxwazên wî pejirandine û fermana agirbestê daye. Seyîd Riza ji vê yekê bawer dike. Ev bawerî dibe sedema girtina wî. Piştî girtinê di demeke kurt de birêveberên KT'ê fermana darvekirina wî pêk tînin. Ji bo ku gora Seyîd Riza bo gelê me nebe serdangeh û xwedan hêzeke manewî, cendekê wî dişewitînin. Di vir de bi zelalî tê fêmkirin ku, rêveberên tirk çawa lawaziya serokên raperînên Kurdistanê tespît dikin û çar xalên ku me li jor rêz kirin pêk tînin.

### Komar bi komployan hate avakirin

Helbet çar xalên navborî ji bo konevaniya dagirkerên tirk a li dijî serhildanên kurdan jî derbas dibin. Lê ne bes ew in. Hin sedemên din jî hene. Sedemên din dê di encama qiyaskirina helwesta KT'ê ya li hemberî tevgera nûjen û raperînên berê de zelaltir bibin û bêne fêmkirin. Berî qiyaskirinê pêwîst e bi kinahî rewşa dagirkerên tirk a di salên 1920'an de bê analîzkirin.

Wekî tê zanîn wê serdemê hestiyê kemalîzmê hêj nerm bû û Mustafa Kemal nû xwe li ser lingan digirt. Mustafa Kemal di wê serdemê de bi komployan, kesên ku li hemberî xwe wekî xetere didîtin, ji holê radikirin û xwe li Tirkiyeyê hêzdar dikir. Her wiha li Kurdistanê jî polîtîkaya, "pêşiyê xwe bi kurdan şêrîn nîşan bide peyre parçe bike û di dawiyê de serweriya xwe xurt bike." meşand. Li hemberî Îngilîstan, Sovyetîstan, Fransa û Îtalyayê polîtîkaya sazkirina hevkêşeyê xurt kir. Yanî li dijî sê eniyan kemalîzm lawaz bû. Bi taswiyekirina Çerkez Ethem û Mustafa Suphi re xwe li Tirkiyeyê xurt kir. Lê serhildanên li Kurdistanê her roja ku diçû pêşeroja wî dixiste xetereyê. Lewre ji bo ku Tirkiyeyê bi dest xwe ve bîne, berê xwe da Kurdistanê. Pêngava wî ya mezin jî ji Kurdistanê dest pê dike. Ji bo vê mebestê jî ew destê serekeşîrên kurdan maçî dike. Heta ji mebûsê Dêrsimê Hesen Xeyrî û yên din dixwaze ku bi cilên xwe yên gelêrî werin meclîsê. Yanî redkirina hebûna kurdan hîn dest pê nekiriye. Redkirina kurdan li aliyekî, ji ber ku mebûsek heqaretê li kurdayetiyê dike, tê kuştin. Mebûsê Meletiyê Mihemedî dema ku heqaretê li kurdayetiyê dike ji aliyê Teslîm Beg (Ew ji hêla Ergûvana li ser Erepgîra Dêrsimê ye) ve tê kuştin. Gelê Dêrsimê ji ber vê rûdanê girtina Teslîm Beg şermezar dike. Ji ber vê Mustafa Kemal mecbûr dimîne ku efûyeke taybet derxe û Teslîm Beg bide berdan. (Dr. Nûrî Dêrsimî) Ji vê mînakê jî zelal dibe ku Mustafa Kemal newêre bi kurdan re têkeve pevçûnekê. Ew bêtir dixwaze xwe bi kurdan şêrîn bide nîşanmdayîn. (Dê bidome)

AHMET HÜSEYÎN

www.arsivakurdi.org

# ...erhengoka têgihên ...êzimanî yên soranî

*Parçebûna welatê kurdan di warê navlêkirina têgihên zanistî de jî hinek dubendî xistine nava gelê ...rd. Lêkolînerên kurd dema li ser ...rekî xebatê dikin, ji hinek çavkaniyan ...idê werdigirin, piraniya wan ...vkaniyan jî bi zimanên serdestan in. ...v yek jî ji bo kurdên her parçeyekî ...urdistanê diguhere. Digel vê yekê ji ...er nebûna otorîteyeke navendî her ...kolîner li gorî zanîna xwe hinek têgi...an diafirîne. Ev yek rewşê aloztir dike.*

*Tiştê ku cihê heyf û dilsojiyê ye jî ev ...: Gelekan haya wan ji yê din nîn e, ...eke hebe jî ji ya xwe nayên xwarê û ...dixwazin dîtina xwe li ser her kesî ferz ...bike.*

*Gava yekemîn a jinavêbirina vê ...aloziyê ji hev û din haydarbûn e. Me bi ...ê mebestê ferhengoka ku di hejmara ...meha rêbendanê ya kovara Kurdica de ...ev kovar li ser înternetê tête weşandin) ...wergirt. Ev ferhengok bi kurdî (soranî) ...i îngilizî bû, me di cihê têgiha îngilizî ...e ya bi kurmancî bi cih kir. Amadekarê ...ê ferhengokê **Siamak R. Durroei** ye. (Samî Berbang)*

**Riste:** hevok
**Waje (wişe):** peyv, bêje
**Pît:** tîp
**Ristey xeberî:** hevoka nûçeyî
**Ristey pirsiyarî:** hevoka pirsiyarî
**Ristey sersorman:** hevok baneşanê
**Firman:** lêker
**Zeman:** dem
**Êsta:** niha
**Rabirdû:** paşeroj, raborî
**Dahatû:** pêşeroj, ayende
**Tak:** yekjimar
**Ko:** pirjimar
**Qeware:** dirûv (form)
**Bine:** ray (kok)
**Nav:** navdêr
**Serbexo:** şênber, berbiçav
**Beste:** razber
**Nasiyaw:** binavkirî
**Nenasiyaw:** nebinavkirî
**Navî komel:** navên komelî
**Cênav:** cînavk
**Wirdewaje:** daçek
**Awelnav:** rengdêr
**Awelkar:** hoker
**Firmanî tewaw:** lêkera negerguhez
**Firmanî:** lêkera gerguhez, dervazî
**Nasiraw:** lebatî
**Nenasiraw:** tebatî
**Wirdewajey peywendî:** gihanek
**Zêdewaje:** qertaf
**Biker:** kirde
**Berkar:** bireser
**Musbet:** erênî
**Menfî:** neyinî
**Restey pêwest:** hevokên hevedudanî
**Restey têkelaw:** hevoka tevlihev
**Pêşgir:** pêşgir, pêrkît, pêşdanî
**Paşgir:** paşgir, parkît, paşdanî
**Hilweşandin:** dahûrandin

# Çend têgihên erdnîgarî û çandinî

**Lix:** alüviyon
**Şilope:** sulu sepken
**Kewke:** kevirê nerm ê di bin erdê de ango granît
**Keloşk:** gir (tepe)
**Genimgêlan:** genimê ku diweşe pirêzeyê û bihara din şîn tê.
**Şawî:** mêrgê avî
**Hez:** bataklık
**Çeper:** dal
**Sayî:** ayaz
**Çiksayî:** kuru ayaz
**Kax:** bozkır
**Bejî:** kıraç
**Saxsî:** sağlam taş
**Tereg:** taraç
**Bager:** fırtına
**Bahoz:** kasırga
**Bablîsok:** hortum
**Kan:** ocak
**Pol:** maden
**Pola:** çelik
**Sifir:** bakır
**Zuxur:** boğaz
**Şiverê:** patika
**Bilqîn:** fokurdama
**Mexel:** mera
**Kelem:** koru, koruluk
**Keresî:** talde (kuytuluk)
**Xalî:** tenha
**Xelxel:** kayalık
**Pîsk:** kırağı
**Pilî:** kulî (kar tanesi)
**Delav:** gölet
**Gumrah:** verimli
**Jêl:** yayvan
**Kovik:** hunî
**Tevirkol:** yerli
**Sûs:** sazlık
**Rewa:** çığ
**Telş:** qelîştek (yarık)
**Şikestina hewayê:** zêdebûna germahiyê
**Sêla sor:** cemre
**Aşît:** çığ
**Herzêl:** çardak
**Çilo:** Çalı
**Quleteyn:** artezyen
**Kurşe:** berfa ku hişk bûye û mirov dikare di ser re bimeşe
**Şûv:** gêng (nadas)
**Şepe:** berfa ku li ser hev kom bûye
**Sape:** asê (sarp)
**Xicir:** xîçik ( çakıl, mucur)
**Şîl:** kesit
**Avgenî:** havza
**Tîn:** ısı
**Lekan:** solên ser berfê
**Tawing:** kızak
**Perçif:** kabartı
**Tang:** dûş (hiza)
**Tên:** rutubet, nem
**Kêmber:** teng
**Surum:** qûşax
**Bayê ecem:** Acem yeli
**Alangoz:** Bayekî serhed ê gelekî sar.
**Bayê sayî:** bayekî sar ê aliyê Çewlik û Mûşê
**Tort:** tortu

CÎHAN ROJ

# Çapemenî

NEJDET BULDAN



E-mail:oramarbuldan@online.de

Giringiya çapemeniyê ji bo civakên hemdem gelekî mezin e. Lê heke civak û rêbertiya wê sererast be. Heke civak pêwîstiya çapemeniyê bizanibe, wê demê çapemenî li gorî pêwîstî û nirxên civakê dibe. Kurtiya wê civak bi çapemeniyê, çapemenî jî bi civakê kêmasiyên xwe ji holê radike.

Li welatê pêşveçûyî pêwîstiya çapemeniyê giringtir e. Ji ber ku di pêşveçûna welatî de dewra çapemeniyê jî mezin e. Li ser parastina demokrasiyê xwedan erk e. Ev tişt nayê wê wateyê ku di çapemeniya wan de xeletî çênabin. Xeletî û kêmasiyên wan jî hene. Lê dema mirov lê dinêre, ew ne kêmasiyên gelek mezin in. Kêmasiyên mîna yên ku li Rojhilata Navîn têne kirin, nayên kirin; hebin jî civak bi lidijderketina xwe nerazîbûna xwe zû eşkera dike. Civak dizane ku guh û çavên wê çapemenî ye. Çawa ku mirov di bedena xwe de li guh û çavên xwe hişyar e, wan ji nexweşiyan diparêze bi civakî jî wisa ye. Tê zanîn ku nexweşiya çav û guhan nayê saxkirin, dibe sedema xerabûna mêjî.

Di çapemeniya welatên lipaşmayî de rastî û xeletî ji hev nayên ferqkirin. Ji ber ku ew welat bi demokrasiyê nayên birêvebirin an jî di demokrasiya wan de kêmasî pir in. Hingî çapemenî (pirtûk, rojname, kovar, televîzyon...) bindest e; di bin bandora rejîmê de ye. Dewlet çi dixwaze, ew tê weşandin. Dewlet çi difikire, ew tê parastin. Çapemeniya ku li dijî wan rêbazan derkeve, li dijî rejîmê tê qebûlkirin. Hingî rewşa wê jî xerab dibe. Dema ku her tişt bi daxwaza dewletê bê weşandin, dewlet kêmasiyên xwe nabîne. Rastî û derewên wê eşkera nabe.

Dewletên bi destê dîktatoran, qralan tên birêvebirin jî rewş pir ne baş e. Hemû nivîs û gotin ji bo pesna kesan e. Welat û nirxên wî, di şexsiyeta qralan de tê zanîn. Welat tune ye. Dîktator an jî qral heye.

Di weşanên sazî û partiyan de jî bi tenê parastina saziyan, partiyan heye. An jî pesna serokê saziyê. Tiştên ku ji bo saziyan baş bin jî heta pesna serokê wê neyê kirin, nayên weşandin. Ew jî dîktatoriyeke cuda ye. Kurtiya wê li welatan, di sazî, partî û hemû civatan de gava yekdengî hebe, ew civak bi pêş ve naçin. Em dizanin ku kesên li hemberî xeletiyan bêdeng bimîne, ne hevalê başiyan e. Hevalê xeletiyan e.

Niha Tirkiye ji bo wê mînakeke gelekî mezin e. Çapemeniya wê bi piranî bindestê dewletê ye. Dewlet jî nîjadperest e. Hingî çapemenî jî nîjadperestiyê dike. Kesên rewşenbîr nikarin dengê xwe bilind bikin. An jî rewşenbîrî di bin bandora dewletê de ye. Mirov hind dikare rewşenbîr be: bi qasî ku dewlet dixwaze. Oldarî jî di bin xeta dewletê de ye. Mirov dikare qasî ku dewlet dixwaze oldar be. Derketina li dijî wê dibin sedemên rewşên xerab û aloz.

Mirov dikare bêje îro çapemeniya tirk dîn bûye. Bêsînor û bêexlaq e. Hemû di êrîş û kirêtkirina li dijî kurdan de azad e. Delîl, argûman pêwîst nîn e. Ji bo ku kurdan pê reş bikin pêwîstiya wan bi hiqûqê nîn e. Ji ber ku zagonên wan ji bo wan in. Heke kesên kurd bi riya qanûnên wan xwe biparêzin ew xeyal e, xewn e.

Dewleta ku firşkê wê haveyna wê bi derew, xapandin û nîjadperestiyê hatibe damezirandin, rewşa çapemeniya wê jî dê wisa be. Bi lez û bez çiqas derewan bike, hurmeta wî zêdetir e. Ji ber wê çendê di gotin û nivîsên çapemeniya tirk de dibe ku rastî jî hebin. Lê mixabin mirov nizane çi rast e, çi jî derew e. Kurtiya wê xerabî li xwe kirin. Mîna ku gotina kurdan bi serê Tirkiyeyê de hatiye. Dibêjin: "Agir bi mala yê derewîn ketibû, mala wî sotibû, kesî jê bawer nekiribû."

www.arsivakurdi.org

# Dayikên Jiyanê

**Dayika Seyran,** deh sal bû, li benda vegera azadiyê bû. Bi rastî qet azadî nedîtibû. Li benda vegerê nebû, li benda hatinê bû. Heta 10–15 sal berê, navê azadiyê jî nizanîbû. Azadî ji bo wê, têrkirin, mezinkirin û zewicandina zarokan bû. Zilma koledaran, zilma mêran qet ne li ser bala wê bû. Welatê wê, gund, malbat û kom û kufletên wê bûn.

Dem û dewran derbas bûbû... Dayika Seyran destê xwe xistibû neqa xwe û mîna serokên ku civatan bi rê ve dibin, wisa ji xwe bawer, bi dengekî xurt û cesaret û her wisa bi edeb, ji civatê re diaxivî. Zilamê Dayika Seyran, di şerê 92'yan ê li Başûr de şehîd ketibû. Lewre ew bûbû sermiyan û malxwêyê malê. Wê, ji mêvanekî xwe re wiha digot: "Mirovatî bi dewletê neyê pîvan. 600 sal e, tirk û bapîrên wan xwedan dewlet in. Ma çi kirine? Li darê dinyayê kî ji wan xweş e? Ji xeynî barbariya xwe bi çi têne naskirin? Byron kî ye? Hûn pê dizanin? Ji Îngilistanê bû, ne wisa? Gelo ji ber çi wî xwe gorî Yewnanîstanê kir? Hest û dilînên wî însanî bûn. Wan zor da wî, da ku ew di oxira Yewnanîstanê de xwe gorî bike. Pîvana mirovatiyê ev yek e!"







Mêvanên Dayika Seyran bi mit û matî lê dinihêrîn, bêyî ku çavên xwe jê bikutin. Yekî di dilê xwe digot: "Gelê kurd 500 sal li pey çaxê mabû, lê pîrek hêj pirtir. Gelo yê ev dayik aniye vê qonaxê çi ye? Ev çi qudret e!"

Dayika Seyran bi coşeke mezin didomand: "Emê komara mirovatiyê ava bikin. Gerîlayên me çiya azad kirine, êdî dema bajaran e. Êdî em jî li benda azadiyê ne.

***

**Dayika Zero** di bin xaniyekî xerabe de, tevî du zarokên xwe jiyana xwe bi zor û zehmetî derbas dikir. Yek jê lawik, yek jê keçik bû. Lawik 9 salî, keçik jî 7 salî bû.

7 sal berê, dema mêrê wê çûbû şer, ew bi keça xwe Rojda bizar bû. Zilamê wê Hesen, piştî salekê, di şer de şehîd ketibû. Li pey vê yekê Dayika Zero lawê xwe yê mezin Ehmed şande şer, da ku çeka bavê xwe hilgire. Lewre axa ku xwîn ji bo wê nayê rijandin, nabe welêt. Şer, piştî dijwariyên mezin azadiyê tîne. Salekê bi şûn de Ehmed jî azad bû. Kete nava karwanê pakrewanan. Li pey Ehmed, Dayika Zero keça xwe Leyla şande nav refan. Leylayê sê salan nav û dengê xwe li her derê welêt belav kir. Çend caran birîndar bû. Piştî sax bû dîsa şer kir. Lê rojekê Leyla jî bi welatê xwe re zewicî. Destên xwe hine kirin, xêliya sor da serê xwe û kete nava karwanê şehîdan. Her ku Dayika Zero zarokên xwe bi Welêt re dizewicandin, kêfxweş dibû. Ewqas birûmet dibû. Wê, Azad û Rojda ji bo rojên pêş perwerde dikir, da ku biçin cihê bav û birayên xwe bigirin.

Rojekê rojnamegerek li Kurdistanê digere û li Dayika Zero rast tê. Pê re dipeyive. Hîn dibe ku mêrê wê û du zarokên wê şehîd in. Jê dipirse: "Tu yê Azad jî bişînî şer?" Dayika Zero: "Belê." Rojnameger dibêjê: "Ger ku Azad jî şehîd bikeve?" Dayika Zero: "Ezê Rojdayê bişînim." Rojnameger cardin jê dipirse: "Lê ku Rojda jî şehîd bikeve?" Dayika Zero dawiyê wisa dibêjê: "Ger Rojda jî şehîd bikeve, ezê bi daran re bizewicim, zarokan bînim, mezin bikim û bişînim şer. Ez vî şerî bêşervan nahêlim."

***

**Ew çend roj bûn,** dengê dahol û zirneyê ji gund xilas nedibû. Keç û xortan dîlan digirtin û distrandin. Dengê wan ji dûr ve dilê mirov zîz dikir. Desmalên kesk, sor û zer, xêliyên ji rengê xwînê mala xwediyê dîlanê, mîna rojên cejnê xemilandibûn. Min tiştek ji vê yekê fêm nedikir. Her ku dengê dahol û zirneyê li ber guhê min diket, min ji diya xwe dipirsî: "Ev çi deng e?" Diya min hêrs dibû, madê xwe tirş dikir û hêstir ji çavên wê dihatin xwarê. Nedixwest li min binihêre. Te digot qey ez ne lawê wê me: "Dayê heyran! Tu çima digirî? Derdê te çi ye? Li mala xelkê dawet e, tu şîna çi dikî? Ka bêje? Ezê ji bo te qutnî û qumaşê Îngilistanê, hevrîşîmê Çînê, gûzê Hindê, Şekirê Şamê, Xurmê Bexdayê bînim...!"

Dayika min mîna kevir. Te digot qey afat di ser de hatiye. Dawiyê vegeriya ser min û got: "Bila Xwedê li şûna te kevirek bida min! Ma min çi xêr ji te dît? Zarê xelkê mezin bûn, bûne mêr, tu hîna mîna xwe yî. Derdê min kirî, kêfê te kirî! Ez ji bo çi digirîm, ew behsa çi dike!" Min gotê: "Erê dayê! Ma çi eleqeya vê û daholê heye?" Wê got: "Kerê evsene! Dengê daholê ji mala Xezalê tê. Daweta kurê Xezalê ye."



Dema behsa kurê Xezalê dikir, madê wê xweş dibû, mîna guleke sor vedibû. Hêstirên xwe paqij dikir û digot: "Bila kes nebîne." Min gotê: "Erê. Ma tu çima digirî?" Gote min: "Ez ji bo te, halê te digirîm. Dema kurê Xezalê tê bîra min, ez şa dibim. Ku ew nebûya, dengê daholê nedihate guhê me. Ew nebûya, belkî çavên me bi dewletan jî neketa. Heft xwezî, ku min jî rojekê daweta te mîna daweta kurê Xezalê li dar bixista. Minê destmaleke sor hilbida û biketama serê govendê. Min heft roj û heft şevan dîlan bigirta."

Min tiştek ji van gotinan fêm nedikir. Sê payiz li ser hev dengê daholê ji mala Xezalê xelas nebû. Diya min her xweziya xwe bi kurên Xezalê dianî û digot: "Deh kurê min ên wekî te hebin an tunebin çi ye?"

Dîsa payîz bû. Gundiyan tedarîkên xwe kiribûn. Wê salê dengê daholê nehat. Min ji diya xwe pirsî: "Dayê! Ma îsal çima ji gundê me dengê daholê nayê? Ma kurên Xezalê tev zewicîn?" Diya min axînek kişand. Min got qey cergên wê qetiyan. Paşê vegeriya ser min û got: "Xebat li Cûdî, Salih li Agirî, Çemşîd li Serxetê û Rizgar jî îsal li Sîpanê şehîd ket. Lewma dengê daholê ji mala Xezalê nayê."

Hêj wê demê min fêm kir, her cara ku dengê daholê ji mala Xezalê hatiye, kurekî wê şehîd ketiye. Piştî çar salan ez çûme mala Dayika Xezal, min dît ku reş girêdaye. Min gotê: "Dema sê kurên te şehîd ketin, te dîlan girt. Lê dema kurê te yê çaran şehîd ket, te reş girêdaye. Ma xêr e?" Li min nihêrî û got: "Ji ber ku tu kesê min nemaye ez bişînim şer. Ger kur an keçeke min hebûya, minê bi dawetê bişanda şer. Peyre jî minê desmala sor hilbida û biketama serê govendê!"

Dawiyê li nav çavê min nihêrî û wekî bêje min: "Ma tu jî nabî kurê min...!"

HARBÎ SOYLU

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ

Li NÇM ya Îzmîrê
● 08.05.1999 şemî
Konferans: Pirsgirêkên Edebiyata Kurdî
Beşdar: Hasan Kaya
saet: 17:00
● 09.05.1999 yekşem
Konsera Hozan Cezmî
Saet: 17:00



Li BEKSAV'Ê ● 08.05.1999 şemî
Forum: Li dûv hilbijartinê
Beşdar: HADEP, ÖDP, EMEP, SÎP
● 09.05.1999 şemî
Konsera Koma Çiya,
saat: 18:00
Li YÇKM'ê
● 09.05.1999 yekşem
Li ser Sînemeyê guftûgo, Beşdar: Ahmet Soner, saet: 15:00

# Fîlmê "Rêwitiya Ber bi Rojê ve" xelat nehiştin!

18'emîn Festîvala Fîlman a Stenbolê ya Navneteweyî di 1'ê gulanê de li Salona Konserê ya Cemal Reşit Rey bi merasîma xelatdayînê û galayê bi dawî bû.

Di vê Festîvalê de di warê neteweyî de 12 fîlm bi hev re ketibûn pêşbaziyê. Di vê pêşbaziyê de fîlma "Rêwîtiya Ber bi Rojê" xelata "Fîlmê Herî Baş ê Tirk" û derhênera fîlm Yeşim Ustaoğlu jî xelata "Derhênera Herî Baş a Tirk" stend. Heman fîlmê xelata ku li ser navê Onat Kutlar tê dayîn ku ji Lijneya Hilbijêr a Navneteweyî ya Rexnegirên Sînemayê (FIPRESCI) pêk tê jî, stand.

Dîsa di heman festîvalê de di warê "Ji Hostayan re Hurmet" de, derhênerê îranî Abbas Kiarostami "Xelata Rûmetê" stand. Wekî din, Derhêner Jerry Shatzberg "Xelata di Tevahiya Jiyanê de Serkeftin", Derhêner Klaksi Balabanov jî "Xelata Juriyê ya Taybet" stand. Juriya neteweyî xelata xwe, da fîlmê Yılmaz Arslan a bi navê "Birîn". Xelata Wezîrê Çandê jî bi fîlmê "Di Keştiyê de", Serdar Akar girt. Xelata festîvalê ya herî mezin "Laleya Zêr" jî bi fîlmê "Tu dibêjî qey ba sekiniye" derhêner Alijandro Agresti stand.

Di festîvalê de fîlmê ku herî zêde xelat girt û zêde bal kişande ser xwe "Rêwitiya Ber bi Rojê" bû. Lewre pêwîst e em bi çend hevokan li ser vê fîlmê rawestin. Di salên dawîn de li Tirkiyeyê fîlmên ku li ser rastiya Tirkiyeyê û Kurdistanê hatine çêkirin bal kişandin. Wekî mînak: "Bila Ronî Netemirin, Bi Xatirê Te Diwaroj, Eşqiya û hwd." Her çiqas ev mînakên me dan ji sedî sed rastiya Tirkiye û Kurdistanê neraxistibin ber çavan jî, di wan de hinek tiştên rast jî cihê xwe girtibûn. Lewre ev fîlm gelekî hatin nîqaşkirin û li wan hate temaşekirin. Naveroka fîlmê Yeşim Ustaoğlu jî li ser rastiya Tirkiyeyê û Kurdistanê ye. Senaryoya fîlm ji çîrokeke ku li cihekî nehatiye berhevkirin, hatiye çêkirin. Serlîstikvanên fîlmê xebatkarên Navenda Çanda Mezopotamya û endamên Şanoya Hêlînê Newroz Şahin, Nazmi Kırık û Mizgîn Kapazan in. Fîlm di navbera têkiliyên du kesên ku ji bajarên xwe hatine bajarê xerîb de, derbas dibe. Ji wan Berzan (Nazmi Kırık) ji gundekî Kurdistanê û Mehmet (Newroz Şahin) jî ji Tireya Îzmîrê hatiye Stenbolê. Berzan li Eminönüyê kasetan difiroşe û Mehmet jî li Sular Îdaresiyê bi zor û zehmet be jî karek dîtiye û dixebite. Di şexsê Berzan de rastiya şerê ku li Kurdistanê didome li ber çavan hatiye raxistin. Di şexsê Mehmet de jî rastiya Tirkiyeyê (wekî li dû tirata fitbolê lihevxistin, şikênandina camên erebeyan û hwd.) hatiye honandin. Herdu xort li dû maçeke ku bi hevxistinê bi encam dibe, li hev rast tên û dibin hevalên hev. Li dûv vê hevdîtinê rewşa jiyana Mehmet jî diguhere. Tiştê herî balkêş jî ji aliyê "kesên nediyar" ve nîşankirina malên kurdan e.

Di fîlmê de teknîk zêde nehatiye bikaranîn. Zêde li ser hestan hatiye sekinandin. Muzîkên fîlmê bi xwezayê re bûne yek û tamek xweş daye fîlmê. Di fîlmê de muzîka Vlatko Stefanoski, Koma Amed û Ciwan Haco hatiye bikaranîn. Ustaoğlu di vê fîlmê de bi cesaret rastiya Tirkiyeyê û Kurdistanê raxistiye ber çavan.

CEMÎL ANDOK/
STENBOL



Rêwitiya Ber bi rojê ve



Derhêner
Yeşim Ustaoğlu



Derhêner
Abbas Kiarostami

## ÇAVDÊRÎ

# Li ser globalîzmê



MİRHEM YİĞİT

Dîroka dirûvdayîna cihanê kevn e. Her împaratorî hewleke nîzamdayînê ye. Mirov dikare ji berî zayînê û piştî zayînê bi dehan nimûneyan bide. Wekî împaratoriya Îskenderê Makedonî, Qeyserên Romayî, Siltanên ereb, Eyûbî, Osmanî û yên sedsala dawî yên ku wekî kolonyalîzm û împeryalîzm nav li wan bûye. Gera Macelan a li dora cîhanê, macerayên Bartelmi Diyaz, Vasko Dö Gama, Marko Polo, Kristof Kolomb, Robin Cruso û kifşên mezin û hwd. Dehfdarên wan giştan yek bûn: Desthilatdarî û dirûvdayîna cîhanê.

Carina van bi navê îlîm û zanyariyê, carina bi navê dîn û Xwedê, carina jî bi navê aqil, siyaset, îdeolojî û demokrasiyê mohra xwe li serdemên xwe xistiye û bûne dîrok. Şerê di nav mesihiyên ewrûpî û Selehedînê Eyûbî de, şoreşên mezin mîna yên Fransa û Rûsyayê her yek bi serê xwe celeb û riyeke dirûvdayîna cîhanê ye. Her nîzam; kultur, model û birêveçûnek e, xwediyê ziman, stîl û çeka xwe ye, li gorî serdema xwe navekî ji xwe re peyda dike.

Îro jî zêde behsa Nîzama Nû û globalîzmê tê kirin. Mirov ji globalîzmê re dikare bibêje cîhangirî, temamgirî yan jî heralîgirî. Ev hinekî jî tê wateya rakirina sînoran, mafê mudaxalekirin û avakirina serbest û çareserkirina pirsgirêkan bi şêweyekî global. Gava mirov di sala 1999'an de li meseleya globalîzmê ango li Nîzama Nû û rewşa cîhana îro dinêre, di nêrîna ewil de çend tişt berbiçav dibin:

1– Globalîzm berî her tiştî bend û îtîfaqa rojavayî û NATO'yê ye. Di vê maneyê de jî teng e, bi navê xwe re li hev nake û pê re ne rast e. Pişta xwe dide zoreke gelekî qebe, mutleq û total. Ew sal bi sal mîlîtarîze dibe, êrîşkartir û hartir dibe.

2– Globalîzmê Neteweyên Yekbûyî bêdesthilatdarî û bêfonksiyon kiriye, NATO'yê dixe şûna wê. Bi vê yekê re jî çi bigir % 10'ê endamên Yekîtiya Neteweyan li Asya, Afrîka û Amerîkaya Latînî bi tiştekî hesab nake û hewl dide ku desthilatdariya 19 dewletên NATO'yê û çend dewletên ser bi vê paktê bi her aliyê cîhanê bide qebûlkirin. Welatê qebûl nake, bi tenê dihêle. Avê ji ser qut dike. Ferman û qiyametê lê radike û nahêle ku ew careke din riya ber lingên xwe bibîne.

3– Bi globalîzmê re, yekmerkeziyetî û sentîralîzmeke amerîkî jî çêdibe. Amerîka xwediyê gotina dawî û sereke ye.

4– Pirsgirêkên neteweyî û navneteweyî li gorî berjewendiyên Amerîkayê û hinekî jî van çend dewletên rojava yan jî serbirojava têne çareserkirin.

5– Globalîst çend pîvanan bi kar tînin. Li cihekî ji sipî re dibêjin sipî, li cihekî din jî ji eynî rengî re reş, an jî tiştekî din dibêjin. Mesela, bi navê mafê xelkê Kosovayê Sirbîstanê didin ber bombeyan. Li aliyê din Demirel, Ecevit û Tansu Çiller a ku Miloseviç avê li destên wan nake, diparêzin û hûn çi dikin li kurdan bikin, hûn serbest in dibêjin.

Durûtî û nerewayiyeke mezin heye li vir. Teslîmkirina Serok û peyre daxistina deriyê MED–TV'yê, ne bi tenê du neheqiyên mezin in li kurdan, belê her wiha du sebebên herî cîdî ne jî ku ji her neteweyî zêditir kurd li Nîzama Nû bi şik û bi xof binêrin û baweriyê pê neynin.

Nîzama cîhanê ku em tê de tunebin û bi ser de jî ew serokê me bişîne mirinê, zimanê me qedexe bike, emê çawa xwe bispêrinê û çawa jê re li çepikan bidin!?

www.arsivakurdi.org

## Rojnameger Nadire Mater li ser "Pirtûka Mehmed" axivî:

# Dayik nobeta zarokê

***Bi xebateke bi vî rengî, we xwest hûn mesajeke çawa bidin?***

■ Ez neketim taya peyam (mesaj) şandinê. Min îdiayeke bi vî rengî jî nîn e. Ez dikarim bi kurtayî, mebesta xwe wiha bidin xuyakirin: Li ser vî şerî, li Tirkiyeyê, ji generalan bigir heta mafparêzan, her kesî der barê şer de hest û ramanên xwe gotin. Lê belê, tenê yên ku di nava şer de ne nepeyivîn. Rewşa van kesan, ku hejmara li dora 2.5 mîlyon e, zêde ne li ser bala kesî ye. Ev kes li ber kamerayan dibêjin: " Dayê li benda min be. Ez ji bo welatê xwe şer dikim." Lê ev kes piştî ku vedigerin nava jiyana rojane, çawa tevdigerin? Min dil kir ez balê bikşînim ser vê yekê û min ji bo van deriyek vekir. Lewre ew dê mesajê ragihînin.

***Li Tirkiyeyê ji bo 'şehîdan' pesindayineke gelekî mezin heye. Ma di bingeha vê yekê de pesna "artêş û mîlîtarîzmê" tuneye?***

■ Ez dixwazim bi gotinên ji 42 xortan yekî bersiva vê pirsê bidim. Wî digot: " Divê jiyan li ber dilê me pîroz be, ne mirin." Bi dîtina min ev tiştekî bingehîn e. Lewre wekî ku xortê navborî got, divê jiyan li ber dilê me pîroz be. Lê mebesta min ne jiyaneke bêdad û newekhev e.

Wekî diyar e, li rojên cejn û salvegeran televîzyon û leşker diçin GATA ( Akademiya Tibîyê ya Leşkerî ya Gülhanê)'yê, bi kesên ku wekî Xazî têne binavkirin re dipeyivin. Li vê derê xortekî qop, bêmil û bêçav li ber kamereya dibêje: "Ez çavên xwe dixwazim." Lê nûçegihanê ku pê re dipeyive, nûçeyê wiha pêşkêş dike: "Çi serbilindiyeke mezin e! Milekî xwe daye" Lê ku em herin bi wî nûçegihanî re bipeyivin, tu caran nexwaze milê xwe bide. Lewre axaftin û kirin li hev nakin.

***Bêhtir rewş û derûniya leşkeran derketiye pêş. Ma tesîra şer gelekî ne berfirehtir e? Rewşa malbatên leşkeran çawa bû?***

■ Bêguman. Bandora şer li hemû civakê bûye. Lê ji ber ku tesîra şer bi awayekî ne rasterast li me bûye, em pê nahesin an jî em nexwazin pê bihesin. Piştî ku min bi dest bi vê xebatê kir, ez jê haydar bûm ku gotina "Agir cihê ku lê pêketiye dişewitîne." çiqas rast û girîng e.

Bêguman rewşa malbatan gelekî girîng e. Tiştê herî girîng li vê derê girîngiya dayikê berbiçav dibe. Lewre dema ku ciwan, nêzîkî mirinê dibin, ku evîndar û dergistiya wan hebe jî, cara yekem diya wan tê bîra wan. Ji ber vê hindê rola dayikan gelekî girîng e. Ji ber ku dayik jî bi awayekî tevî zarokên xwe leşkeriyê dikin. Bo nimûne hin dayik nobetnameya (nöbet çizelgesi) zarokên xwe dizanin û nobeta wan dişopînin.

***Wekî di pirtûka we de jî diyar e, şerê tesîreke mezin li civakê kiriye û her ku diçe xerabtir dibe. Ma civakê rastiya şer fêm nekiriye? Gelo civak hîna vî şerî wekî fîlmekî dihesibîne?***

■ Ji encama hilbijartinan diyar e ku hîna fêm nekiriye! Gelek rojnameger û nivîskaran piştî ku pirtûk xwend, got: "Me digot em der barê rewşa herêmê de bi gelek tiştan zanin. Lê em têgihiştin ku zanîn û agahiyên me gelekî kêm in." Dema nivîskar û rojnameger wisa bêjin, mirov nikare ji civakê tiştekî bi vî rengî hêvî bike.

Dema mirov 2.5 mîlyon leşkeran, tevî nas û derdora wan binirxîne, ev digihêje nîvê serjimara (nifûs) Tirkiyeyê. Nîvê serjimara Tirkiyeyê bi awayekî tesîra şer wergirtiye. Xuya ye her tişt bi awayekî sergirtî rû dide. Bo nimûne dayikên ku lawê xwe ji dest dane, li ber



"Pirtûka Mehmed" yekemîn pirtûka Nadire Mater e. Pirtûkê gelekî deng veda. Mater li sala 1949'an de li Sokeyê ji dayik bûye. Wê di sala 1977'an de [illegible] kiriye. Di sala 1981'ê de dest bi rojnamegeriyê kiriye û ji sala 1994'an [illegible] Rojnamegerên [illegible] dike. Mater her wiha endama ÖDP'ê ye.

***Rola çapemeniyê di vî şerî de çi ye? Derdorên artêşê gotibû: "Em dê bi piştgiriya çapemeniyê di vî şerî de bi ser bikevin."***

❑ Ez dixwazim bi mînakeke biçûk bersiva pirsa we bidim. Dema Hayri Kozakçıoğlu parêzgarê (walî) OHAL'ê bû, li Stenbolê beşdarî brîfînga Konseya Çapemeniyê bûbû û wiha gotibû: "Hûn rojnamegerno! Dema maça Tirkiye û Swîsreyê hûn dilxwazê kê bin, divê hûn têkoşîna li dijî terorê jî wisa temaşe bikin." Ev dîtineke girîng û bingehîn e.

***Gelo ku heya îro zarokên van kesan di şer de bihatana kuştin an jî di nava şer de bûna, vî şerî dê evqas dirêj bikira?***

❑ Li her derê cîhanê wisa ye. Dema Şerê Ermenîstan û Azerbeycanê ez li Bakûyê bûm û şerperestî gelekî xurt bû. Lê zarokên hemû bûrokrat û payebilindan li Tirkiyeyê li zanîngehê dixwend. Li aliyê din zarokên hejar û xizanan digot: "Em bihostek axa welêt jî nadin kesî!" Li vê derê jî wisa ye. Lewre mirov nikare bersiva pirsa "ger bûya" bide.

***Hûn gelek rojnamegerên cîhanî û Tirkiyeyî ji nêzîk ve dinasin. Ma rojnameger dema li ser doza kurdan sohbetê dikin, wekî ku dinivîsin dipeyivin?***

❑ Ez ne li ser çapemeniyê, dê dîsa li ser Hayri Kozakçıoğlu mînakeke bidim. Dema ew parêzgarê Stenbolê bû, rêzecivîn dihatin lidarxistin. Di van civînan de, bi şertê ku neyê nivîsîn, her tişt bi serbestî tê nîqaşkirin. Li wê derê Kozakçıoğlu bêpaye û bêpênas(ûnvan) axivî, ez şaş û metel hiştim. Axaftineke dîrokî bû. Wê demê min di dilê xwe gotibû: "Kesê ku van tiştan dibêje, wê ji bo çareseriya vê meseleyê bixebite." Mixabin wisa nebû.

Li aliyê din li vî welatî her kes xwedî dîtineke fermî û nefermî ye. Lê helwesta rojnamegeran girîngtir e. Lewre ew her tiştî radigihînin. Jixwe her tişt bi du-helwestiya rojnamegeran dest pê dike.

***Bi kurtayî Kozakçıoğlu çi gotibû?***

❑ Got: "Meseleya li wê derê aborî, civakî û çandî ye. Bi tenê bi tevdîrên aborî û kuştina mirovan çareser nabe." Ma em jî wisa nabêjin!

***Helwesta çapemeniya tirk a der barê şer de, bi zordariya hin hêzan ve tê girêdan. Ma ku îro ev hêz nebin, wê çapemenî li gorî pîvanên etîkî û mafên mirovan tevbigere?***

❑ Êdî otosansûr heye. Tiştê xeternaktir ev e û ji vê yekê xwe şûştin ewqas ne hêsan e. Li aliyê din li vî welatî, gelek tişt jî hatine gotin. Serokê Dadgeha Bilind (Yargıtay) got: "Li Tirkiyeyê dadgeh ne serbixwe ne." Îro jî Serokê Dadgeha Qanûna Bingehîn dibêje: " Li Tirkiyeyê azadiya xwederbirînê (îfade) nîn e. Divê hemû qanûn bêne guhartin." Tu şaşwaz dibî. Li aliyekî wekî ku her tişt tê gotin, li aliyekî wekî ku tu tişt nayê gotin. Ma di rewşeke wiha de mirov dikare çi bike?!

# xwe dişopînin

Li welatê me, nûçeyên "rûpel sisê" ên li ser şîdetê, piranî wisa dest pê dikin: "Kesekî ku leşkeriya xwe li Rojhilatê Başûr kiriye...." Ev kesê ku em 18 mehan wekî leheng bi nav dikin, ji nişke ve dibin mêrkuj. Leşkerekî piştî ku vegeriyaye malê, dê, bira û xwişka xwe kuştiye.

meraye, di nava psîkolojiya girse- de dibêjin: "Ez dê lawê xwe yê yemîn, sêyemîn jî bişînim leşke- yê." Lê em gelekî baş pê dizanin rastî ne wisa ye û nexwaze lawê we bişînê. Dîsa berî vê bi çendekê bernameya Dr. Stres de dayikeke dengekî nizm got: "Ez lawê xwe din naşînim." Lê dayikên din li jî wê derketin û wan got: "Em dê şînin." Lê ez pê zanim, ew jî nex- azin. Ma çima mirov bixwaze wê mirov bimire? Hem jî ji bo tiş- kî ku zêde pê nizanibe...

***Di pirtûkê de tiştekî herî balkêş helwesta leşkerên çepgir(!) e. Ev s, berî ku herin leşkeriyê li dijî r in, niha jî Nazim Hikmet û Gülün Solduğu Akşam (Şeva ku ul Çilmisî)" dixwînin. Lê ev kes, êm û zêde wekî dewletê li doza urdan dinihêrin. Hûn vê yekê ça- a dinirxînin? Ma ev ne cihê reş- înî û bedbîniyê ye?***

■ Ji ber ku kêfa min ji bedbîniyê nayê, ez vê yekê wisa şîrove na- kim. Vê yekê li aliyekî jî ez kêfxweş şaşwaz kirim. Bi vê xebatê min dît u, li Tirkiyeyê mirov difikirin û lê xebitin ku tiştên ku diqewimin êm bikin. Her çend mirov nikaribe van kesan bigihêje encameke se- rast jî lê bi baweriya min ev kes di ava civakekê de bireke (kesim) ezin pêk tînin. Ev kes, tevî ku ke- ne taya debara (geçim) xwe jî, ewl didin xwe ku bûyer û mesele- an fêm bikin. Bi raya min ev cihê kêfxweşî û geşbîniyê (iyimserlik) e.

Ew tiştê ku we destnîşan kirî jî xwe li vê civakê problema gelek esan e. Gotin û kirinên gelek kesan hev nakin. Lê ez pê bawer im û êvîdar im, wê ev tişt safî bibin. Ji er vê çendê ez ne bedbîn im.

***Lê wekî we jî got xurtbûna MHP'ê darî çavan e...***

■ Bêguman xurtbûna MHP'ê gelekî girîng e. Lê dema mirov li hilbijartinên piştî serdema 1980'î binihêre, hilbijêran (seçmen) her dem sûprîzek kiriye. Her dem en- camên ne li gorî pêşbîniyên (tex- mîn) çapemeniyê hatin wergirtin û er wiha hilbijêran her dem hin kes û partî ceribandin.

Bêşik di xurtbûna MHP'ê de, sersarî û xemsariya ji bo şehîd û leş- keran cihekî gelekî girîng digire. Tevahiya civakê ev kes di ser guhên xwe re avêtin. Ev rewş çawa pêk hat? Bo mînak; di nûçeyên li ser ce- nazeyên şehîdan de, navê rayedarên payebilind ên beşdarî merasîmê di- bin heye, lê navê wî xortê ku miriye tune ye. Ji ber vê hindê malbat gele- kî tenê man. Lewre bi awayekî su- riştî neteweperestî xurt bû. Lê bi nêrîna min ev rewş wiha berdewam nake. Dîsa nêrîneke geşbîn...!

***Li aliyê din ji gotinên leşkeran diyar e ku, tevî nefretê li hemberî gerîlayan sempatiyeke wan jî heye. Hûn çawa dibînin?***

■ Ez jî di vê baweriyê de me. Ji ber ku hest û ramanên wan gelekî nelihev û nakok (çelişik) in. Lewre li Tirkiyeyê her kes li gorî çapeme- nî û 'cîhana xwe ya biçûk' li mese- leyê dinihêre. Lê dema ku ji gund û bajarokên (kasaba) xwe derdikevin, pê dihesin ku mesele ne wekî ku ha- tiye gotin e.

***Hemû leşker, ên çepgir jî di nav de, dema dipeyivin dibêjin; "ew der, ev der, ew mirov" Ev bi awaye- kî qebûlkirina "çand û diyareke cûda" nîn e?***

■ Lê kurd jî êdî wisa dibêjin. Her ku diçe ev yek berbiçav dibe. Îro gava "Herêm" tê gotin, Herêma Egeyê nayê bîra kesî! Ji ber ku ter- mînolojiyeke nû hate afirandin. Go- tinên wekî "ev der, ew der, herêm" êdî ne şîfre ne, gotinên ji rêzê ne.

***Li ber destê we hin xebatên din ên bi vî rengî hene? We dil heye li ser gerîlayan jî xebatê bi vî rengî bikin?***

■ Mirov dikare gelek tiştan bike. Jixwe bi vê pirtûkê, min dest bi xe- bateke bi vî rengî kiribû. Lê herdu bi hevre neçûn serî. Ji aliyê derûnî ve bi min giran hat. Lê min dil heye bi wan re bipeyivim. Lewma bi dîti- na min gelek tiştên ku ew bêjin he- ye.

Aliyên şer ên din jî girîng in; ge- rîla, malbatên gerîlayan, cerdevan hwd. Lê xebateke li ser gerîla ewqas ne hêsan e. Du sedemên vê yekê he- ne. A yekem, ez nikarim bi pey ge- rîlayan bikevim. Rewşa min a fîzîkî rê nade vê yekê. A duyem, ku ez ge- rîlayan bibînim jî, bi baweriya min, wê gotina xwe bipîvin û biaxivin.

***Ev ji 20 salan zêdetir e hûn herêmê dinasin. Hûn dikarin wêneyekî van 20 salan bikşînin?***

■ Berî vê 20 salan me pêjna tiş- tine din dikir lê îro ne wisa ye. De- ma di sala 1977'an de ez çûbûm Batmanê, cudahiya mezin ya di navbera taxên xizan û dewlemendan de balê min kişandibû. Hevaleke min ya rojnameger, ku Şerê Bos- nayê şopandiye, ji bo ku here herêmê hate Stenbolê. Min dil kir ez hinekî behsa herêmê bikim. Lê wê guh neda min û hema bêje wisa got:" Ma tu min bi çi dihesibînî? Min gelek tişt dîtine." Dema em li balafirgeha Amedê peya bûn, şaş û metel ma û wiha got: "Ez hemû go- tinên xwe bi şûn de digirim."

***Tiştekî ku me nehişt hûn bêjin...***

Ez dixwazim balê bikşînim ser şîdeta piştî şer. Tevî ku di ser Şerê Vîetnamê re evqas sal derbas bûn jî, îro tesîra vî şerî hîna jî berdewam e. Li Amerîkayê yên ku bêmal in û li kolanan şeperze ne, beşdarên Şerê Vîetnamê ne. Dîsa yên ku şîdetê bi kar tînin, ev kes in. Li welatê me jî, nûçeyên "rûpel sisê" ên li ser şîdetê, piranî wisa dest pê dikin: "Kesekî ku leşkeriya xwe li Rojhilatê Başûr kiriye...." Ev kesê ku em 18 mehan wekî leheng û egît bi nav dikin, ji nişke ve dibin mêrkuj û hov. Divê em gelekî bala xwe bidin ser vê yekê. Leşkerekî piştî ku vegeriyaye malê, dê, bira û xwişka xwe kuştine. Lê bav û nasên wî dikin nakin vê rewşê nikarin rave bikin.

Dîsa bavê leşkerê ku balafir re- vandibû wiha digot: " Ên mirî şehîd in, ên seqet Xazî lê emê çi navî li yê me bikin! Dewlet zarokên me sip- saxlem dibe lê dema li me vedigerî- ne, kontrol nake. Divê piştî ku teda- wî kir, bişîne malê." Li vî welatî ji sedî pênc xort di bin tesîra şer de mane. Ez jî êdî li taksîajoyan hêrs nabim. Pêşîn hîn dibim, gelo ev jî yek ji wan kesan e?

MAZLÛM DOĞAN

## Dîroka 'gayrî resmî' ya şer:

## "Pirtûka Memed"

15 sal in gelên Tirkiyeyî bes ji "daxuyaniyên resmî" ku li ser maseyê hatine nivisîn, li ser şer agahî wergirtin. Rojnameyan li ser heman bûyerê jimarên (rakam) cuda ragihandin. Bi awayekî din rojname ev 15 sal in derewfiroşiyê dikin!

Pirtûka rojnameger Nadire Mater ya bi navê " Pirtûka Memed- Leşkerên ku li Rojhilatê Başûr Şerkirine Vedibêjin (Mehmedin Kitabı-Güneydoğu'da Savaşmış Askerler Anlatıyor)" li ser dîroka "gayrî resmî ya şer" berhemeke bêhempa ye. Bo nimûne dayika Leşkerekî ji Mater re dibêje: "Tiştên ku ji min re negotin, ji te re gotin. Heft xwezî ez li şûna te bûma."



Nadire Mater pirtûk di salekê de amade kiriye û ligel 42 leşkeran axiviye. Di pirtûkê de serpêhatiyên leşkeran rasterast hatine weşandin. Pirtûk 267 rûpel û ji sê beşan pêk hatiye: Memed Dipeyivin, Li Ser Navê Ên Nekarîne Bipeyivin, Jimar. Di nava pirtûkê de ji bo sînemayê serpêhatiyên gelekî balkêş û guncaw hene. Her çend Kurdistanî bi kêm û zêde bi bûyerên di pirtûkê cih girtine zanin jî, divê bêhtir ew vê pirtûkê bixwînin. Lewre gelek tiştên ku hîn bibin hene. Hin jêgirtin ji Pirtûka Memed:

*"...Hin kesê nexweş tiliyên keçeke mirî jêkirine. ...Rojname dibêjin ev mirov hemû nezan in, gişan zanîngeh xilas kiriye. ...Neteweperestên tûj dema tên dibêjin 'em dê welêt rizgar bikin.' Lê dema vedigerin wisa nafikirin. ...Nîve şevê min bi qirka jina xwe girtiye. ...Piştî 15 salan her roja leşkeriyê di bîra min de ye. Me heya sibe gule teqandin. Serê sibe me lê nihêrî, me qantir kuştine. ...Medya aliyên xweşik nîşan dide. Lehengî falan bêvan beredayî ye. Ew der ne li ser bala kesî ye. ...Ku Öcalan nebûya mesele dernediket. Rehmetî Türkeş gotibû: "Ez dê di nava sê mehan de safî bikim" Ma çima destûr nedanê. ...Yê li hemberî te wekî artêşekê tevdigere. Çavê li artêşê li ser wan. Çima neqade? Ez jî fêm nakim. ...Fermandarê tofê (bölük) got: "Ku kî ji min re seriyekî bîne, ez dê leşkeriya wî kurt bikim." ...Ku leşker keysa xwe lê bîne, wê bireve. ...Min findiq dane zarokan, jendermeyekî rahiştinê û got: "Ew terorîst in!" ... Ku ez li Rojhilatê bim, ezê jî piştgiriyê bikim. ...Leşkerên kurd hemû kom kirin. ...Me digot eşîr bi hev ketine. Fermandar digot: "Dev jê berde! Bila koka hev biqelînin." ...Li malê min ji bavê xwe re digot komûtan. ...Tîmên Taybet xwedêyê wê derê ne. ... Kî ji bo çi dimire? Ev şerê pereyan e."*

www.arsivakurdi.org

# Helbestine bi şehê evînê şehkirî

## Nameyek

*Delala lêvkaxiz*
*Ez di vê sersalê de bi şîn im*
*Min pênûsek awarte*
*Standibû ji bo te*
*Lê belê ezê li cihê wê*
*Hêstirê xwe bişînim*
*Li min bibore*

*Delala bejinzirav*
*Min vê havînê*
*Bi tîrêjên rojê û bi şehê evînê*
*Kemberek honand*
*Ji te re şand*
*Xwe şa kir*
*Lê belê min kinî û dirêjiya te ji bîra kir*
*Li min bibore*

*Delala pakrewan*
*Delala nemir û ciwan*
*Daxwaza min ev e ku*
*Vê nameya mêvan*
*Mîna dilê min dan birîn e*
*Dema te ew xwend*
*Bila nola xelatekê*
*Li cem dilê te bimîne*
*Li min bibore*

İlhami Özer



## Kêliyeke Jiyanê

*Ev der*
*Ev war*
*Çiqasî dûrî min e...*
*Nava min agirekî sor*
*Derveyî min şîfonekî spî*

*Gelek caran bi riyên kêzikan*
*cih-mala xwe dibînim*
*Ronî nîvro bi goga dilîzim*
*Û ji fermandarên rihan re*
*Fermanan radikim*
*Ji bo kuştina xwe*

*Dizanim...*
*Tu tişt nikare min xelas ke*
*Ji lûleyên tivingê...*
*Hêviyê dîtina diya min jî*
*Tenê dibe devkeniyek*
*Li ser wecê min*
*Bi xwînsariya laşê min re...*

Şêxmûs Sefe

## Aşê hêviyan

*Hey aşvano*
*Piştqilûzo*
*Porspiyo*
*Qeraşo*
*Ev çi ye tê serê te lo?*
*Ev serê çendan caran e*
*Lasera vî feratî*
*Sukira te xera dike*
*Aş diçe, dimîne çeqçeqo*
*Û*
*tu*
*her tim*
*Dikevî pey çeqçeqo*
*Sukir girêdidî,*
*Saz dikî êş.*
*Ne laser têr dibe ji xerakirinê*
*Ne tu diwestî ji saz kirinê.*
*De bihêrin*
*Bihêrin derd û kulan*
*Bihêrin hêviyan...*

Roşan Lezgîn

## Stêrka bêçirûsk

*bi stêrkan re em rûdinin*
*û her şev*
*hesabên hatina tê em dikin bi tiliyan*
*stêrk westiyan, tefiyan*
*ê min jî çend stêrk hêviyên min ê vala mane*
*weke tivinga bêgule*
*an tu yê werî*
*min bikî xwedî stêrk*
*an tu nayê*
*wê stêrk bibin xwediyê min*

*min neke qeşmerê stêrkan stêrk*

*fermo zû were*
*di êvarên esmer de qemer esmer were*
*li stêrkan siwarê û were*
*bibe stêrk û were*

*çavên min ji bêxewiyê bûne berbang*

*berî bêhna nanê sibê*
*bifûre li bajêr*
*her sibe dengbêjên min birçî distirên*

*bi serê kenê te yê delalî*
*ez dûr ne baş im*
*bi serê tirsê te yê delalî*
*ez kûr ne baş im*
*dimirim îro*
*ne di nîvê şevê gurxenêq de*
*ro li nîvro*
*destbirakê min ezraîl*
*navnîşana min dojeh*

*stewr im ji aliyê fikran*
*avis im ji aliyê hîsan*
*ev dest her sibe destên te dizên*
*ev lêv her êvar lêvên te dizên*
*ev dil her şev dilê te dizê*
*dergûşê!..*

Rênas Jiyan

## Gulîsora bejî

*dilê min şûna bênderek şewitî*
*ax û arî...*
*bi bayê bezê derbas dibin*
*lod bi lod hesretên tomarkirî*

*li ser sîng û berê evînkujan*
*dilop diniqutin paxilê*
*dilopên agirîn*
*ji min were*
*cangoriyek biyanî ye dîrok*
*li paş deyeke nîvcomayî*

*ken û kêf di devê min de*
*pariyên necûtî*
*di qirka hêviyê min de*
*dilîrînin*
*uxkeuxkê kuxikên dojehî*

*ez*
*barkêşê gulîsorekê me*
*ne simbêlsor im jî*
*qermîçekên heftê salî*
*ne bawer in, ez dijîm lê...*
*li kurdistanan*
*li benda gulîsorek bejî!*

Emîn Bozan

www.arsivakurd.org

## Yaser Arafat dewlet îlan nekir

# Serxwebûna Filîstinê "ma bihareke din"



**★ BEŞA NÛÇEYÊN DERVE**

**4'ê gulanê ji bo filistîniyan wekî rojeke dîrokî hatibû diyarkirin. Wan hêvî dikir ku dewleteke serbixwe were îlankirin lê ev hêviya wan ma bihareke din.**

4'ê gulana 1999'an di ser Peymana Osloyê re 5 sal derbas bûn. Li gorî biryara peymana navborî, diviyabû Kêşeya Filistînê gihîştibûya encamê ango Filistînî bibûna xwedan dewlet. Rayedarên Rêxistina Rizgariya Filistînê ( RRF) jî çêlî daxuyaniya dewleteke serbixwe dikir. Lê piştî ku Serokê RRF'ê Yaser Arafat li gelek welatan geriya, li ser pêşniyaza wan biryara îlankirina dewleteke serbixwe taloq kir. Di biryara RRF'ê de hate gotin ku ew dixwazin mijara serxwebûnê bi hikûmeta nû ya Îsraîlê re nîqaş bikin. Li Îsraîlê dê di 17'ê mehê de hilbijartinên giştî bê ne lidarxistin. RRF hêvî dike ku dê Netanyahu nekaribe bi ser bikeve, dê Partiya Karkeran were ser kar. Rayedarên RRF'ê bi wê partiyê re safîkirina mijarê hêsantir dibînin.

Li aliyê din tê gotin ku Arafat ditirse ku heke serxwebûnê îlan bike, dê Netanyahu herêma dagirkirî bi temamî ilheq bike. Ji niha ve niştecihên cihû berê xwe daye çêkirina avahiyên nû li ser erdê dagirkirî. Tevî ku Netanyahu di meha kewçêra 1998'an de soza vekişîna ji vê herêmê dabû Clinton jî, ev soza xwe bi cih neanî

Roja 4'ê gulanê Serokwezîrê Îsraîlê Benyamin Netanyahu civîneke çapemeniyê li dar xist û di vê civînê de biryara RRF'ê wekî serkeftina xwe nîşan da. Li gorî Netanyahu, Arafat divê ku dê hikûmeta Îsraîlê reaksiyoneke tund nîşan bide, gav bi paş de avêtiye. Lê rayedarên Partiya Karkeran bi awayekî din meseleyê dinirxînin. Bo nimûne, rayedarê Partiya Karkeran Sholomo Ben Amî dibêje: "Tiştê ku ew dibêje serdanpê propaganda ye, dixwaze têkçûna xwe wekî serkeftin nîşan bide." Li gorî Ben Amî filistîniyan ji ber helwesta Netanyahu di qada navneteweyî de piştgiriyeke mezin bi dest xist. Kesên di vê baweriyê de nameya ku Clinton ji Arafat re şandiye wekî nimûneya herî diyarî çavan a vê serkeftinê dibînin. Her wiha ew balê dikişînin ser piştevaniya dewletên Ewrûpayê jî. Yekîtiya Ewrûpayê daxuniyeke hevpar da û piştevaniya xwe ji bo mafê çarenûsiyê yê gelê Filistînê diyar kir.

Rêveberiya Filîstinê van tiştan wekî serkeftina xwe dibîne û di wê baweriyê de ye ku Netanyahu bi vê hişkebaweriya xwe alîkariya wan kiriye.

Serokê Partiya Meretz jî vê nirxandinê dike: "Ma dewleta filistîniyan niha nîn e? Ez nizanim dewlet çi ye? Erdê wan heye, serokê wan î hilbijartî heye. Sirûda neteweyî, ala wan, têkiliyên wan bi 100 dewletî re heye." Arafat jî di heman baweriyê de ye. Wî jî di Televîzyona Filistînê de got: "Ew bixwazin jî nexwazin jî dewleta me jixwe heye." Arafat da zanîn ku dewleta wan roj bi roj gavan ber bi pêş davêje.

Helwesta gelê Filistînê ya li hemberî biryara RRF'ê jî bi awayekî din bû. Roja 4'ê mehê li gelek bajaran xwepêşdan li dar ketin û di van çalakiyan de bi êrîşên polîsên Îsraîlî 17 kes birîndar bûn.

Li aliyê din gelek filistînî nerazîbûna xwe li hemberî biryarê tînin zimên. Li gorî lêpirsîna Navenda Lêkolîn û Lêpirsînê ya li bajarê Neblûsê piştevaniya ji bo Arafat ji sedî 80'yî daketiye ji sedî 50'yî.

Her wiha gelê Filistînê nerazîbûna xwe ya li hemberî rêveberiya Filistînê jî diyar dike. Tê gotin ku rewşa aborî ya herêmê gelekî xerab e, rêjeya aşbetaliyê ji sedî 40 e û gelek mirov gilî û gazinan ji rêveberiyê dikin. Ji ber ku ew karên nelirê dikin. Li gorî heman lêpirsînê ji sedî 71'ê beşdarên lêpirsînê daye zanîn ku rêveberên herêmî di nav karên nelirê de ne. Bi tenê ji sedî 26'ê beşdaran hêviya xwe ya demokratîkbûna desthilatdariya Filistînê aniye zimên.

Gelek filistînî dixwazin ku rêveberiya Filistînê ya heyî demokratîktir û abadantir bibe.

## DI ÇAPEMENIYA CÎHANÊ DE KURD

### "Li dijî Öcalan, doza tolhildanê"

✔ Rojnameya îtalî Corriere Della Sera roja 3'yê gulanê di bin sernavê li jor de nûçeyeke şîroveyî li ser Doza Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan weşandiye. Di nûçeyê de digel agahiyên giştî, li ser bûyerên li DGM'ya Enqereyê jî hatiye rawestandin. Di nûçeyê de tê gotin ku raya giştî ya tirk li pey tolhildanê ye û ev helwesta xwe jî di hilbijartinê de nîşan daye. Di dawiya nûçeyê de van gotinên balkêş cih girtiye: "Tiştê daxbar, gerîlayên PKK'ê yên ku doza xweseriyê dikin, li Tirkiyeyê wekî terorîst têne binavkirin, lê gerîlayên UÇK'yê ku ji bo xweseriya Kosovayê şer dikin jî wekî leheng têne dîtin."

### "Kurd ditirsin ku rêveberiya belediyeyê ji dest wan bê girtin"

✔ Rojnameya The Independentê di hejmara xwe ya roja 3'yê gulanê de di bin vî sernavî de cih daye nûçeyeke li ser Belediyeya Amedê. Di nûçeyê de ev gotinên Serokê Belediyeya Amedê Feridun Çelik cih digirin: "Gelê kurd dengê xwe da me, ji ber ku em lê dixebitin ku Kêşeya Kurd ji cîhanê re vebêjin." Di nûçeyê de nirxandina bi rengê "dewlet îdia dike ku piştevaniya gel bo PKK'ê nemaye, lê gelek Amedî di wê baweriyê de ne ku, her dengê bo HADEP'ê piştevaniya PKK'ê ye jî" cih girtiye. Di nûçeyê de li ser îhtîmala girtina HADEP'ê jî hatiye rawestandin. Li gorî amadekarên nûçeyê, hinek Amediyan tirsa xwe ya li ser, ji hêla dewletê ve desteserkirina rêveberiya belediyeyê jî aniye ser zimên.

### Ji Kêşeya Kurd re çareseriya îslamî

✔ Ajansa Reutersê roja 2'yê gulanê nûçeyeke şîroveyî ragihandiye aboneyên xwe. Ev nivîs, ji hêla Jonathan Lyons ve hatiye amadekirin. Di vê nivîsê de Lyons li ser nêzîktêdayina nû ya rêveberiya Xatemî ya li ser kurdan dinirxîne. Di nivîsê de çêlî 'çareseriya îslamî' hatiye kirin. Wekî nîşaneya vê çareseriyê, hatiye gotin ku kurdek bi navê Abdullah Remezanzade wekî rêveberê bajarê Senendejê hatiye şandin. Nûçeyê cih daye van gotinên wî yên bi rengê "Xatemî dema hilbijartinê hat Kurdistane û got ku kurd gelekî qedîm e û divê di karê Îranê de zêdetir dengê wî derkeve." Ajansê serboriyên Senendejê wekî ezmûneke dijwar a li ber Xatemî nirxandiye.

www.arsivakurd.org

*Zarokên kurd, piştgiriya xwe ya ji bo Abdullah Öcalan, bi nameyên xwe nîşan da.*

# 'Ezê bibim abûkat û te rizgar bikim'

Hevalên hêja,

Hêzên dagirker û împeryalîst serokê kurdan bi komployeke navneteweyî dîl girt. Ew niha li Girava Îmraliyê di bin mercên giran de dijî. Hemû têkiliyên wî bi cîhanê re hatine qutkirin, lê gelê kurd jî ji bo ku wî bi tenê nehêle di nava xebatê de ye. Hinek hevalên we jî name ji wî re bi rê kirine, kopiyeke wan nameyan jî ji abûqatên wî re hatiye şandin. Em ji wan nameyan çend heban ku tê de evîn û hesreta dilên biçûk heye, pêşkêşî we dikin.



Bêrîvan

## Serokê min ê birêz;

*Tu çawa yî? Baş î. Navê min Bêrîvan e. Ez diçim pola duduyan. Dewleta tirk tu girtiye. Tu hatina me, tu pêşeroja me yî. Ez mezin bibim, ezê bibim leşker, bibim gerîla. Çapemeniya neyar, der heqê te de nûçeyên derew diweşîne. Ez qîzeke kurd im. Hemû gelê kurd, em te bi tenê nahêlin. Newroza te ya derbasbûyî pîroz be!*

Lîder (11)

## Tu bavê kurdan î

*Serokê min ê birêz;*

*Me girtina te bihîst. Em gelekî li ber ketin. Em dixwazin te bibînin. Dijmin timî li ser te derewan dike. Serokê min ê hêja, hezkirina min a ji bo te qet xilas nabe. Ez dixwazim bêm hevdîtina te lê destûrê nadin. Tu ne terorîst î. Tu bavê kurdan î. Em gelekî bêriya te dikin. Em pir ji te hez dikin; emê tim li ser şopa te bimeşin. Navê min Lîder, temenê min 11 e. Ez jî Apocî me. Ez ji Nisêbîna Mêrdîmê me. Gava ez mezin bibim, ezê bibim leşkerê te.*

*Her wext û li her deverê, ezê li ser şopa te bimeşim.*

Levent

## Hûn evîndarê zarokên kurd in

*Serokê min, em gelekî ji we hez dikin. Em dixwazin bibin şagirtên we; em dixwazin bên cem we. Serokê min ez 9 salî me. Ez zarokekî kurd im. Pêşeroja me, ne bi kesekî din, encax ku hûn hebin watedar dibe. Her kes dixwaze pêşeroja we xilas bike. Lê hûn dixwazin ji me re pêşerojekê biafirînin. Ji ber vê yekê kî çi dibêje, bila bibêje; hûn tekane evîndarê zarokên kurd in. Ji ber vê, em gelekî ji we hez dikin û daxwaza me ya yekemîn ew e ku di rewşeke azad de, em we bibînin.*

Raziye –Zîlan– (10)

## Serokê min ê birêz;

*Gava me tu di firokeyê de, çavgirêdayî û destên kelemçekirî dît, em gelekî xemgîn bûn. Lê kesên ku tu teslîmî destekî din kir, nabin leheng û wê nebin leheng. Eger ku leheng bûna, egîd bûna, çavên te bi wan terîşên reş girênedidan. Ez dixwazim hîn bibim, ka îşkenceyê bi te dikin an na?*

## Gurbet Serokê xwe maçî dike

*Navê wê, Gurbet Yılmaz e. Heft (7) salî ye. Ji ber ku hîn xwendin û nivîsandina wê tune ye, ji serokê xwe re wêneyek xêz kiriye û şandiye. Ew Serokê xwe maçî dike.*



Burçin (8)

## Ez pir pir ji te hez dikim

*Serokê min ê hêja;*

*Tu çawa yî? Navê min Burçin e. Ez heşt salî me û diçim polaya duyemîn. Ez ji Agiriyê me. Serokê min ez pir pir ji dewleteke kurd hez dikim û ez ji te jî pir hez dikim. Dewleta tirk dixwaze me xilas bike. Lê em zarokên kurd, emê di riya te de têbikoşin û emê timî hebin. Gava ez mezin bibim, ezê bibim abûkat. Ezê te û kurdan biparêzim. Emê li serê çiyayên xwe êgir vêxin; li wir govendê bigirin; emê ji bo kurdan şer bikin; dewleta kurd ava bikin. Wê neteweya kurd mezin bibe û di nav mirovatiya cîhanê de cihê xwe bigire.*

*Ez pir pir ji te hez dikim.*

Seyitxan

## Serokê min ê birêz;

*Ez hêvî dikim ku tu baş î. Ji bo ku tu gelê kurd rizgar dikî, dewleta tirk kete pey te. Piştî 25 salan tu girtî û tu kirî Zindana Îmraliyê. Her roj îşkenceyê bi te dikin. Ji ber vê ez gelekî xemgîn im û bi ber te dikevim. Ku ji destê min bê, ezê hemû Tirkiyeyê xira bikim û bişewitînim. Bi hezaran însan, di zindanan de ne; piraniya wan ji bo azadiya te û jiyana te girtî ne. Emê hemû, di vê riyê de berdewam bimeşin. Tu serokê hemû kurdan î. Te ji bo me mirin da ber çavên xwe; em jî di riya te de ji bo ku canê xwe bidin amade ne. Heya em hebin, dijmin mehkûmê binketin û tirsê ye. Ez deh salî me; ji Mêrdînê me.*

*Silav û rêz...*

Tuba

## Serokê me yê hêja Apo!

*Ez dixwazim pêşî xwe bidim nasîn. Nav û paşnavê min Tuba Erçetin e. Diçim polaya pêncemîn; yanzdeh salî me. Ecevit ji bo girtina te pir kêfxweş bûbû. Ew ji bo şehîdên xwe bê çi dikin. Lê kes li şehîdên me napirse!*

*Bi silav û hurmetên xwe...*

Gökhan (11)

## Ezê jî beşdarî gerîla bibim

*Serokê min ê birêz;*

*Em hêvî û daxwaz dikin ku di demeke kurt de tu werî berdan. Ez yanzdeh (11) salî me, diçim polaya pêncan. Em hemû kurd, emê bên û te xilas bikin. Ez gelekî ji te hez dikim. Em hêvî dikin ku di dadgeha were de, tu bêyî berdan. Emê te ji wir rizgar bikin. Ezê jî beşdarî gerîla bibim.*

# Hejmara duyemîn a Hunerê derket




Kovara demsalî, çandî û hunerî Huner ku ji aliyê Akademiya Çand û Hunera Kurdî ve tê weşandin bi hejmara xwe ya duyem derket pêşberî xwendevanên xwe. Di vê hejmarê de jî nivîsên cur bi cur hene.

Di kovarê de nivîsa Kakşar C. Oramar bi sernavê "Stêrka Geşa Ezmanê Huner û Muzîka Kurdistanê" balê dikşîne ser xwe. Di nivîsê de Oramar li ser jiyana Miryem Xanê radiweste. Kakşar C. Oramar di nivîsa xwe de diyar dike ku Miryem Xan jina kurd e ku di dîroka Kurdistanê de yekemîn car ketiye qada huner û strana kurdî û stranê Miryem Xanê jî bi piranî li ser qebûlnekirina neheqiyan û mêrxasiyê ye.

Di kovarê de nivîsek din ku bala mirov dikşîne jî hevpeyvîna ku bi hunermend Ilana Eliya re hatiye çêkirin e. Ilana Eliya bi eslê xwe ji Başûrê Mezin e; cihû ye û piştî damezrandina dewleta Îsraîlê ji Zaxoyê çûye Îsraîlê. Eliya diyar dike ku li ber wan, ji axa bav û kalan, tiştek bi xwe re nebiriyê. Li Îsraîlê gelek hêjarî û zehmetî kişandine. Li ser pirsekê hunermend Ilana Eliya wiha dibêje: "Kurdên Îsraîlê heta niha jî li ser perwerdehiya xwe ya kevn mane. Îro jî zimanê xwe baş dizanin. Di jiyana xwe ya rojane de heta xwarin û kincên kurdî jî têne dîtin."

Eliya diyar dike ku roja Newrozê ji bo kurdên Îsraîlê rojek taybet e û di Newrozê de kurd tev derdikevin seyranê. Her wiha hunermend Ilana Eliya dibêje ku guhdarên mûzîk û konsertên wê giş bi kurdî dizanin.

Di hejmara duyemîn a kovarê de, hevpeyvînek bi hunermend Aram Tîgran re cih digre. Hevpeyvîn ji hêla Kakşar C.Oramar ve hatiye çêkirin û bi taybetî li ser jiyan û muzîka hunermend Aram Tîgran hatiye rawestandin. Di hevpeyvînê de, Aram Tîgran diyar dike ku bavê wî ji wî re gotiye "divê tu qet başiyên gelê kurd ji bîr nekî, ji ber ku kurdan em ji tevkujiya jontirkan xilas kirin. Eger îro hûn hene, ji başiya gelê kurd e." Di hevpeyvînê de tê xuyakirin ku Tîgran xebatên xwe li ser vê bingehê dimeşîne.

Her wiha di kovarê de rexneya Kenan Şêxo ya derheqê nivîsa Hemdullah Baqî, ku di hejmara Hunerê ya yekem de derketibû, balê dikişîne. Kenan Şêxo di nivîsa xwe de diyar dike ku Hemdullah Baqî, heta radeyekê dikare jiyana Mihemed Şêxo bizane. Li gorî Kenan Şêxo, ji bo ku mirov nivîseke bi vî rengî binivîse, divê jiyana mirovên mîna Mihemed Şêxo baş bizanibe. Kenan Şêxo bi tundî diyar dike ku her pênc helbestên ku di nivîsê de cih digrin, nerast hatine nivîsandin. Li gorî Şêxo mirovê ne şivan be, divê karwanan li pêşiya xwe neajo.

Di kovarê de her wiha mirov dikare li ser nivîsa Beşîr Botanî ya bi sernavê "Ji Sêrtê ta Osloyê" çend tiştan bibêje. Beşîr Botanî ku lawê Sebrî Botanî ye di nivîsa xwe de jiyana Seyda Sebrî Botanî radixe ber çavan. Di nivîsê de tekîliyên Botanî bi Mistefa Berzanî û dengbêja folklorî Miryem Xan re têne vegotin.

Ji bilî van nivîsan, çend nivîsên ku di vê hejmarê de cih digrin ev in: Ramana Xwekujiyê–Bavê Kardox (Helbest), Eyşe Şan–K. Xorşîdî, AwatCelal Melîkşa (helbest), Nivîseke Bizmarî–Kawa Nemir (helbest), Nêrîn û lêkolîneke dîrokî li ser Şanoya Dayikî Nîştiman–Birayîmî Ferşî, Dîtineke Kurt Li Ser Rewşa Şano û Şanogeriya Me, Di Roja Îro DeDewran Agirî û hwd.

SERWÎSA ÇANDÊ

## 333 sal berê, roj

HASAN KAYA



*"Tasek ji vê ava zelal*
*Nadim bi hewzê Kewserê*
*Levhatina Qesra Şîrîn*
*Jê nabînim tu meferê*
*Piştî ku roja me bû tarî*
*Mirin xweş e ji emberê"*

Dema ku Ehmedê Xanî ev gotinên jor nivîsîn, ew çardeh salî bû. Yanî di sala 1665'an de. Bi awayekî din, em dikarin bibêjin ku ev helbesta Xanî bîstûşeş salan piştî Peymana Qesra Şîrîn hatiye nivîsandin. Lihevparkirina Kurdistanê êşek kiriye nava Xanî, qîrên ku wê demê wî dane, gihîştine roja me û îro jî ew qîr ji rewşa me re bûne tercûman, ji birîna me re bûne melhem. Feylesofê dûrbîn, welatê xwe şibandiye rojê, çawa ku kurdan 333 salan pişt re serokê xwe şibandiye rojê.

Qederê bîst şiîrên feylesof Xanî li ber destê me ne. Beşa edebiyata klasîk a înstîtuyê li ser wan dixebite. Înşeleh di pêşerojê de ew dê bibine pirtûk û bêne ber destên we xwendevanan. Hinek ji wan şiîran li tu deran nehatine çapkirin. Hinek ji wan jî, li bakurê Welêt nehatine çapkirin.

Tam û sûda her yek şiîrê nayê tarîfkirin. Heçku Xanî îro rûniştiye, li rewşa kurdan nêriye û bi çavên tijî hêstir, şiîrên xwe ristine. Mînak:

*"Aşiqê dilberhebîn dildarê dîdarê xwe ye*
*Da bizane her kesek bê şibhe xemxwarê xwe ye*

*Maceraya Xidir û dîwarê yetîmê bû selef*
*Vî zemanî her kesek mîmarê dîwarê xwe ye"*

Xanî di ristika pêşî de ne ku pir ji xwe re dixwaze. Ne ku egoîst e. Qala kedê dike. Li gorî wî, yê ku neafirîne û ne xemxwarê xwe be, nikare bide jî. Yê ku dilê yara xwe nexwaze, nikare dilê xwe jî bide tu kesên din. Di ristika duyemîn de jî, dibêje êdî ew meseleya ku Xocê Xizir tê, dîwarê sêwiyekî xera dike û dema ku sêwî ji nû ve dîwarê xwe lê dike, di kolanê de gencîneyekê dibîne, bûye çîrok. Divê ku kurd bi xwe hewl bidin da ku bibin xwediyê welatê xwe.

Evîna Xanî wisa afat e ku di tu sînorên olî, neteweyî û kevneşopî de hilnayê. Tu tişt nikarin evîna wî qeyd û bend bikin. Çawa ku gotiye;

*"Paşê lêvê wê dê venaxwim mutleq ava Kewserê*
*Min nivê dunya bi carek paşê wê sîmen berê*

*Ger bizanim ez di heşrê de nebînim dilberê*
*Cenetê dê pê çikem pê wer bikim xaka ser rê"*

Wekî ku tê dîtin, Xanî bi alîkariya bawerî û ilmê tesewûfê, evîna xwe ya ku damarên wê ji hezar salan berê tên û hê jî didome, ji cenetê bilintir digre.

Çawa ku îro jî dermanê me evîneke kûr e, zanîn û ilmekî dorfireh e, Xanî wî zemanî ev tişt wiha aniyê zimên;

*"Meger her min divê dilber, du sed ilmî bikim ezber*
*Ji xilxalan dibit ebter, mela mexsûdê xilxalî*

*Mela mexsûdê min xal e, ne milk û menzel û mal e*
*Ne ilmê qal, ew hal e me hasil kir bi ebdalî*

*Me hasil kir bi xizanî, bi miştaqî û heyranî*
*Wekî kenca di wêranê, me peyda kir bi remalî..."*

www.arsivakurdi.org

# Baweriya bi Şeytên

Rojekê zilamek di civatê de dibêje: "Ma wê Şeytan tim û dayîm di cehenemê de be. Weleh ev neheqî ye!"

Dema civat belav dibe, zilamê ku şeytan di civatê de parastiye jî, tê mal û radizê. Di xewna xwe de şeytên dibîne. Di nav wî û şeytên de axaftinek wiha derbas dibe:

Şeytan: Te îro ez di civatê de parastime û te ji bo min tiştekî baş kiriye. Divê ez xelatekê bidim te û başiyekê (qenciyek) bi te bikim.

Zilam: Çi başî?

Şeytan: Tu li dû min were.

Zilam dide dû şeytên û diçin nav erdekî beyar. Şeytan cihekî şanî zilêm dide û dibêje: "Di vir de xezîne heye. sibe serê sibê were vir bikole; tu yê xezîneya xwe bibî. Lê belê em niha di xewnê de ne, divê tu vir nîşan bikî ku tu winda nekî."

Zilam: Ez çi îşaretê deynim?

Şeytan: Hema li ser pîsiyê bike.

Zilam gava li ser pîsiyê dike, di nav nivînan de jina wî ji bêhnê hişyar dibe û dibêje: "Ev çiye te bi xwe de kiriye?! Em ji bêhna pîsiya te fetisîn." Wexta zilam radibe, dibîne ku di bin xwe de kiriye. Îcar radibe dijûnan li şeytên dide.



## Gundî û Ga

Gayek, her gav dikeve nav zeviyê gundiyekî. Gundî difikire ka çi bike ku êdî ew ga nekeve nav zeviya wî. Diçe bi zanayan dişêwire ku çawa pêşiya gê bigire. Zanayek jê re dibêje: "Biçe, di nav zeviyê xwe de çalekê vede, gava ga were bikeve nav zeviya te, wê bikeve wê çalê û tuyê jî jê xelas bibî. Zilam diçe, di nav zeviyê xwe de çaleke kûr dikole, ser wê bi qirş û qalan digire û xwe di pişt kevirekî de vedrişêre. Dinihêre ku ga tê û dikeve çalê. Zilam diçe ser çalê ji gê re dibêje: "Tu yê bikevî nav zeviya min ne. De îcar tu dikarî derkevî!." û henekên xwe pê dike. Zilam ji nişka ve gêr dibe û ew jî dikeve nav çalê. Îcar ga çavên xwe sor dike ku lê bide; zilam hema bang dike: "Ya Xwedê tu alîkarê min û gê tev bî." Ji gê re jî dibêje: "Ya gayê mezin, min kir tu neke. Ez di bextê te de me, min kir tu neke."

BERHEVKAR: ABDURAHİM KAYA

## Apo bihişt jî hêsan kiriye

Li gundekî Şemzînanê, xortek di meha remezanê de, ne rojiyê digire û ne jî nimêjê dike. Bavê wî xortî dike nake lawê wî nimêj nake û rojiyê nagire. Her çiqas dibêje jî, fêde nake û bê çare diçe cem melayê gund û jê re meseleyê dibêje ku mele lawê wî bîne ser îmanê.

Mele tê, wî xortî dibe odeyekê û li ser rojî û nimêjê jê re xeber dide. Mele çi jê re dibêje, di dawiya hemû hevokan de, dibêje: "Tu yê biçî bihiştê." Paşê xort li mele dinihêre û dibêje: "Niha mele, ev saeteke ku tu behsa rojiyê, nimêjê û îslamê dikî, hemû ji bona çûyîna bihiştê ye?"

Mele dibêje: "Erê xwarzê. Her tişt ji bo bihiştê ye."

Îcarê xort lê vedigerîne û dibêje: "Mele, Apo bihuşt jî hêsan kiriye. Ji bo çûyîna bihuştê, pêwîstî bi rojî û nimêjê nemaye. Ger tu bixwazî biçî bihuştê, çekê xwe têxe destê xwe biçe serê çiyê. Heke tu dixwazî di nava bihuştê de bibî melaîket, bombeya Zîlanî li ser xwe girêde û di nava komek gurên çavsor de biteqîne. Yanî ew qas hêsan e. Ê ma çi pêwîst e tu xwe birçî bihêlî û bikemilînî?

BERHEVKAR: QAHİR BATEYÎ

## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (171) XAÇEPIRSA



PEYVA VEŞARÎ

### Bersiva Xaçepirsa 169'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binirxînin û bi riya peşkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 171'ê pirtûka Hasan Kaya 'Girnewas' e.




**Jêrenot:**

*Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.*

Kesên xelata hejmara 169'an pirtûka 'Irakta Kürt Sorunu' qezenç kirine ev in: Çiya Rênas/ Mêrsîn, Zeki Aslan/ Kayseri, Berfin Adar/ Mêrsîn, Nezir Erdemci/ Agirî.




PEYVA VEŞARÎ 1 2 3 4 5




# Şaro meseleyan xo çareser keno

MEMED DREWŞ
(e.mail:mehmet@welat.com)

**Hezarana kurdan banê belediye ziyaret kerdê, serokan rê serkewtin wastê û vatê, ma dest ra çiçî yeno, ma hedre yim. Bi rastî kêfweşîn çimanê Amedijan ra waniyayê. Feqet serokê belediyeyan kêfweşîna piya tarî tarî fikiryayê û iyê fikiryenê. Şaro înan ra xizmet paweno. Belediyeyan ra xizmet pawitin haqê şarî yo. Êkê hetanî nika weçînyayê û biyê serokê belediyeyan, tûnikê kerdê pirî û remayê.**

No hefte ezo nêşena, xeberanê Îmralî binûsî. Çike ez nika Îmralî ra, nezdiyê 2 hezar kilometrey ...ri ya. Ezo nê niwisî bajarê Kurdistanî, ...êrdîn ra nûsena. Eke hetanî hefteyo ...n teva nêbo, ezo xeberanê Îmralî nûs... ...dewam bikirî. Coka ezo wazena no ...efte heveyê vatenanê Serokanê Belediyan sero vindirî.

...1'ê menga Gulana 1999 de Stenbol ra ...ya zeriya Kurdistanî Amed. Rewşê A...medî heveyê vuryabi, zey verî nêbi. We...çînayinê 18'ê menga avrêla 1999 rewşê ...medî vurnabi. Şarê kurd weçînayinê ...'ê menga avrêla 1999 de, dostî kerdî... kêfweş û dişmenî jî eciznaybî. Coka jî ...wşê Amedî zey xeylê cayan vuryabi. ...rê Amedî goreyê bajaranê bînan he...yna vêşî kêfweşî bî. Çike înan belediya Amed %64 girotibî û kêfê ci ca de menga gulana 1999 de min Serokê Belediyeya Sur Cezayir Serin ziyaret kerd çiyê ke, ey ardî ziwan zeriya min veşnê. Hele wexto ke Cezayir Serinî fekê xo akerd tayn mendbi ke, a seat pereyê ke min tûnik de estîbî vejî û bidî ey. Peranê xebatkarana Hotelê Dedeman de nan wardo. Serokê Belediyeya Sur Cezayir Serin rewşê belediye û kerdenê serokê verînî wina ardî ziwan: "Serokê verînî (FP'yij) veyndarto kesan û vato 'ti zanê/a elif bê biwanê' eke zanayo girotê belediye. Vato 'ti zanê/a Yasin biwanê', eke zanayo girotê belediye. Vato ti zanê/a 'Kelimeyî Şaadet biyarê'eke zanayo girotyayê belediye. Nika hîrê qat vêşî xebatkarê belediye estê. Nezdiyê heşt trîlyonî deyn esto. Hewt mengî yo kîraya banê belediye nêdiyayo, feqet şiyê Hotelê Dedeman de Mîlyarûnîma warden (nan) wardo. Pereyê xebatkaranê silasnayanêxo vêşî vêşî dayê, feqet xebatkaranê xerîban şeş hewt mengiyo nêdayê". Serokê Belediyeya Sur Cezayir Serinî qiseyê xo wina dewam kerdî: "Verê weçînayinî des pancês rojî serokê verînî qandê fina qezenckerdin 152 kesî girotê belediye, nika waliyo vîze nêdano nînan, coka ma mecbûrê ke nînan belediye ra vejê. Xora ma mevejê jî, ma nêşenê peranê înan bidim. Ancî serokê verîn tevayê belediye nêternayo pêro rotê. Feqet ancîna mayê zor bidim xo ke, nê deynan ra belediye bixelsinim û şarê Sur rê xizmet bikim."

### ...erokê belediyeyan tarî tarî fikiryenê

Hezarana kurdan banê belediye ziya...et kerdê, serokan rê serkewtin wastê û ...atê, ma dest ra çiçî yeno, ma hedre ...im. Bi rastî kêfweşîn çimanê Amedijan ...a waniyayê. Feqet serokê belediyeyan ...êfweşîna piya tarî tarî fikiryayê û iyê ...fikiryenê. Şaro înan ra xizmet paweno. ...Belediyeyan ra xizmet pawitin haqê şarî ...yo. Aw çiniya, kuçey rijniyayey û lîmin ...(qilêrinê). Kuçey mêsan û mêrşan ra ...pir ê. Êkê hetanî nika weçînyayê û biyê ...serokê belediyeyan, tûnikê kerdê pirî û ...remayê. Hem jew tûnikê xo pirkerdina jî ...nêmendê, tûnikê silasnayanê xo jî kerdê ...pir, belediyey deynan miyan de ternayê. ...Ezo wazena çend nimûney bidî. 3'ê

### Kuçeyê Qoser biyê zey miyanê odeyê keyî

Rewşê belediyeyanê Kurdistanê pêrîn nezdiyê belediyeya Sur o. Ezo wazena ma heveyna goş bidim Seroka Belediyeya Qosere (Kızıltepeyê) Mêrdîn Cihan Sincar. Cihan Sincar jî serokîna Qoser %69 qezenc kerdo. Çiyê ke, Cihan Sincar ardî ziwan kes şaş maneno. Goreyê vatena Cihan Sincar; serokê verînî (ANAP'ij) kotî miryanê ci estîbiyê zey xebatkarê belediye mûsnayê, her serê meng de pereyê nînan dayê. Nê winî taynî jî niyê, êkê hetanî nika ay tesbît kerdê, hewtsey kesê û nê hewtsey kesan ra heveyê Stenbol, Enqere, Adna, Îzmîr û zey cayanê winayinan de ronişenê, heveyê jî estê iyê zankeyanê (universte) Metropolan de wanenê. Yanê qe nêşiyê nezdiyê banê belediye, heta nêşiyê Qoser jî feqet her meng pereyê xo girotê. Cihan Sincar nê hewtsey kesî belediye ra vetê û aya vana ke, hewna jî winayinî estê. Ancî Cihan Sincar vat ke, lazim o ke xebatkarê belediyeya Qoser 250 kesî bê. Feqet nika 1500 ra vêşiyê. Ancî goreyê vatena Sincar 8 trilyon deynê belediyeya Qosere esto. Goreyê menga avrêla 1999 jî qezencê belediye 66 milyar o. Seroka Belediyeya Qosere Cihan Sincar da zanayin ke, her çiqas rewşê belediye wina yo jî aya zor bido xo, nê meselan çareser bikiro.

Ma Cihan Sincar het ra vejiyayin peyra jî, çend Qoserijana qisey kerd. Goreyê vatena înan Cihan Sincar nika ra heveyê meseleyê Qoser çareser kerdê. Aw û pakîn. Seroka Belediyeya Qosere mesela aw û pakîn çareser kerda. Kuçeyê Qosere hend biyê pakî ke, kes vano qayê kuçey niyê, miyanê odeyê keyî yo. Ancî kesê ke, ma pa qesey kerd, kêfweşina xo anê ziwan û vanê ke, hewna jû menga Cihan Sincar pir nêbiya, ay meseleya aw û pakîn çareser kerd. Hetanî nika çimanê ma aw nêdî, feqet nika awa ma esta, ze ke tiyê jî vînenê kuçeyê ma jî biyê pakî. Sincar biya leteyê zeriya Qoserijan

Ancî înan vat ke, mayê Cihan Sincara teva nêpawemi, a meselanê Qosere ma ra rind zana, mayê bawer kemi aya hemû meselanê Qosere jew jew çareser bikiro. Cihan leteyê zeriya Qoserijan a. Qandê karanê ay rehetkerdin, ma dest ra çiçî bêro ma yê bikirê. Hetanî nika kesî nêşayê çinayê xo yê keyîya şiro belediye, feqet nika zey verî niyo, ganê to senî wazeno winî şo, kes to ra teva nêvano. Goreyê vatena înan banê belediye biyo zey keyeyê Qoserijan. Hem jew banê belediye tenya jî nê, keyeyê Cihan Sincar jî biyo keyeyê Qoserijan. Xora Cihan Sincar xo jî keverê belediye sero nûsto ke, êkê wazenê min ziyaret bikirê wa bêrê keye de ziyaret bikirê. Yanê belediyeya Qoser nika ra biya belediyeya şaran. Xora belediye ke, bî belediyeya şaran, meseleyê wijay rehat çareser benê. Zey Belediyeya Qosere.

www.arsivakurdi.org

*Li navçeyên Gihadîn û Tetwanê dizî, tehdît û lîstikên hilbijartinê*

# HADEP'ê qezenc kir dewletê desteser kir


Ferrah Diba Ergül

**Li Gihadînê HADEP hilbijartinê bi 959 reyî belediyeyêqezenc dike. Lijneya hilbijartinê ya bajêr bi awayekî fermî bo dayîna mazbateyê bangî HADEP'ê dike. Lê tîmên taybet reyan direvînin, 245 reyên HADEP'ê tên dizîn. Lijneya bajêr ligel banga xwe ya fermî mazbateyê dide Partiya Fazîletê.**

Bêdadî û demokratîknebûna hilbijartinên sala 1999'an bi xwe re gelek encamên neyînî anîn. Di hilbijartinê de digel ambargo û qedexeya ku li ser HADEP'ê hatibû danîn jî li ber îradeya gelê kurd têk çû. Li gelek bajar, navçe û beldeyên Kurdistanê belediyeyên ku HADEP'ê bi dest xistibûn, bi lîstikên cenbazî ji destê HADEP'ê hatin derxistin. Di nav wan de du belediye hene ku bala raya giştî têr dikişînin. A yekem belediyeya beldeya Gihadînê ye. A duyemîn tiştên ku hatine serê berendamê Tetwanê ye. Li ser hilbijartin û qewmînan em bi berendama belediyeya Gihadînê Ferrah Diba Ergül û Şevket Aslan re axivîn.

## Gelê Gihadînê derbeyeke xedar li feodaliyê xist

Li gorî agahiyên ku me ji berendama serokatiya belediyeya Gihadînê girtin, li Gihadînê 15 hezar mirov dijîn. Navçe ji dema avabûna Komara Tirk ve di bin desthilatdariya mêran de bûye. Dîsa 75 sal in ku herêm ji aliyê malbatên Peker û Özmenan ve tê birêvebirin. Piştî ku HADEP li herêmê vedibe, îradeya gel li dijî îtîfaqên feodal û paşverû bandorê li rêveberiyê dike. Li gorî ragihandina Ergül, bi kêmanî 500 jin beşdarî mitîngên ku li herêmê pêk tên, dibin. Tê gotin ku bi ciwanan re têkiliyên temendirêj hatine danîn û hêza gel derbeyeke xedar li hêzên paşverû û feodal xistiye.

Bi encama hilbijartinê jî ev yek tê dîtin. Li Gihadînê hejmara hilbijêran 5100 kes bûye. Hejmara reyên ku hatine bikaranîn jî li dora 4500'î ye. Reyên ku hatine pejirandin jî 4000 hezar bûye. Ji van reyan HADEP'ê 959, ANAP'ê 757, FP'ê 796, CHP'ê 579, DYP'ê 621 rey standine. Ev encam bi awayekî fermî ji aliyê lijneya hilbijartinê ya bajêr û navçeyê ve hatiye îlankirin. Berendama HADEP'ê Ferrah Diba Ergül bi 959 reyî wekî Seroka Belediyeya Gihadînê tê hilbijartin. Li ser vê yekê partiyên wekî ANAP, DYP û FP'yê di 19.4.1999'an de li dijî encamê derdikevin û ji lijneya hilbijartinê ya navçeyê daxwaz dikin ku jimartin ji nû ve bê kirin. Lê ev daxwaz ji aliyê lijneyê ve nayê pejirandin.

## Tîmên taybet reyên HADEP'ê didizîn

Li ser vê yekê Ferrah Diba Ergül diçe ku mazbateya xwe bistîne. Lê berî ku Ergül mazbateyê bistîne serê sibeyê tîmên taybet reyên hilbijartinê bi serê xwe dibine bajarê Agiriyê. Li bal wan tu kesê peywirdar nîn bûne. 245 rey ji navên HADEP'ê tên deranîn û nayên pejirandin. Lijneya hilbijartinê ya bajêr hejmara reyên HADEP'ê ji 959'an dadixe 714'an û bi biryara 'kêmasiya reyan' di cihê HADEP'ê de bo standina mazbateyê FP'ê peywirdar dike. Li gorî berendama HADEP'ê Ferrah Diba Ergül, diviya sandoq li gorî qanûna 298'an di bin çavdêriya serokê sandoqan û endaman de biçûna bajêr. Dîsa ew diyar dike ku, diviyabû hejmartin ji tasnîf bi awayekî vekirî bihata kirin. Ligel vê yekê serokê lijneya hilbijartinê ya Bajêr Hakim Kamuran Damar bi awayekî veşarî rey jimartine û nehiştiye ku kes bikeve odeya jimartinê. HADEP'iyên ku bi bûyerê dihesin li navçeyê meşekê li dar dixin. Di meşê de nêzîkî 40 kes ji aliyê polîsan ve tên binçavkirin.


Şevket Aslan

## Ergül bi ser neheqiyê de diçe

Berendama HADEP'ê Ferrah Diba Ergül li ser van rûdanên neyinî, serî li Lijneya Bilind a Hilbijartinê dide. Hîna tu encam derneketiye. Li gorî Ergül ji sedî sed ew mafdar e û ew dê belediyeyê ji destê FP'ê derxe. Li pey van agahiyan Ergül da zanîn ku partiyên hetanî niha dijberî wan kar kirine, niha piştgiriya wan dikin. Berendamê ANAP'ê Yaşar Özmen diyar kiriye ku wîjdanê wî ne rehet e, lewre jî ew dê helwesta xwe li aliyê HADEP'ê nîşan bide. Berendama jin Ergül wekî delîl biryara lijneya hilbijartinê ya bajêr û navçeyê û raporên 27 sandoqên hilbijartinê pêşkeşî lijneyê kirine. Ew diyar dike ku dema encameke dijberî wan derkeve dê serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê bidin.

## Li Tetwanê gef û êrîş

Li Tetwanê jî di hilbijartinê de gelek astengî derketin. 13'ê meha avrêlê berendamê belediya Tetwanê Şevki Aslan û heyetek ji PM'ya HADEP'ê dixwazin ku bi waliyê Bedlîsê re hevdîtinekê pêk bînin. Ajokarên teksiyan ji ber ku ji aliyê dewletê ve hatine tehdîtkirin wan li erebeyên xwe siwar nakin. Ligel vê yekê heyet problem û astengiyan ji walî re vedibêje. Walî dixwaze ku li polîsan ne girin û îdare bikin.

Piştî hevdîtinê Aslan dixwaze bi qay meqamê Tatwanê re hevdîtinekê pêk bîne. Mixabin ev daxwaz ji aliyê qaymeqam ve nayê pejirandin. Di vê navberê de Hüsamettin Akdeniz, Çetin Yılmaz û Nazım Gönen berî hewlên Aslan dixwazin ku li Tatwanê hem teşkîlat hem jî bûroya hilbijartinê ava bikin. Ev hewl ji aliyê polîsan ve hatiye berbendkirin. Li gorî ragihandinan simbêlê wan kesên ku xwestine teşkîlatê ava bikin di bin çav de ji aliyê polîsan ve hatiye qusandin. HADEP'î li hemberî vê yekê reaksiyona xwe nîşan didin. Lê di demeke kin de polîs, leşker, tîmên taybet û cahşên girêdayî gundê Sakê dora taxê dixin bi çeperê. 16'ê meha avrêlê polîs dibêjin: "Eger hûn ji vir neçin emê dikanê bombe bikin." Berendamê HADEP'ê Şevki Aslan vê carê jî li ser navê xwe serî li lijneya bajêr a hilbijartinê û emniyetê dide. Daxwaza vekirina teşkîlat û bûroya hilbijartinê tê pejirandin. Aslan xaniyekî distîne. Polîs dîsa ya xwe dikin û diçin li daîreya tapoyê, tapoya Aslan desteser dikin.

Birayê xwediyê xaniyê ku Aslan distîne tê binçavkirin. Di bin çav de fermandarê tûgayê yê bi navê "paşe" dibêje: " Tu Ecevit nas dikî? Ew jî were vê derê em nahêlin HADEP teşkîlatê veke." Li gorî dazanîna Aslan konvoya HADEP'ê ji aliyê tîmên taybet ve tê sekinandin, pîştî lêgerînê kaset winda dibe. Roja hilbijartinê jî HADEP'ê nikarî bûye çavdêran bişîne ser sandoqan. Kesên çûne ser sandoqan bi kuştinê hatine tehdîtkirin. Aslan piştî ku sandoq vedibin diçe ku reyan bihejmêre. Polîs û cahş wî dîsa bi kuştinê tehdît dikin. Aslan jî ji ber çewsandin û tehdîtên kuştinê roja hilbijartinê dev ji her tiştî berdide û ji Tatwanê direve. Aslan di dawiya axaftina xwe de xwest ku di demek zû de raya giştî dest bavêje Tatwanê.

AZAD ALTUN

www.arsivakurdi.org